

GUNDIYÊ

Helbestên xortanî

M. Nureddin Yekta

M. Nureddin Yekta kî ye?

Di 24.03.1957'an da li bajarê Mûşê hatiye dunyayê.

Di biçûktiya xwe da dest bi dibistana seretî û ilmê medresê kir. Piştî dibistana seretî di medresanda

xwendina xwe domand.

Bi medresê ra jî, him lisa Îmam-Hatip û him jî Sosyal bilimler xwend.

Di 29.09.1978 di Diyanetê da dest bi wezîfê kir û di sala 1994'an da jî, dev ji wezîfa Diyanetê berda.

Di despêka sala 1997 derbasî Almanya bû. Ta niha bi sedan nivisarên wi di kovar û malperên internetê da û heft heb jî pirtûkên wi hatine weşandin.



Pirtûkên wi:

- 1- Elifba Quranê û Tecwid (kurdî û erebî)*
- 2- Kuran Elifbasî ve Tecvit (türkçe ve arapça)*
- 3- Gundîyê (Helbestên xortanî)*
- 4- Sevdam bir güle (gençlik şiirleri)*
- 5- Pêkeniyên kurdî*
- 6- Ümmetin Mazlumları kurdler ve Kurdistan*
- 7- İslam'da Irk sorunu ve kurdler*

Rojbaş gelî xwendevanan!

Wek min di helbestekî xwe da gotiye ku.

"Ne şair im ne dengbêj im

Te hiş birî ez kerr û gêj im

Hêsrên ji çavên xwe direjim

Hêsrêm ji bo te dibarin."

ez şair û helbestvan nînim, lê ji zaroktiya xwe da ta îro

carnan min çend rêzan nivîsandîye dişibuhun helbestan û

min xwest ku ev rêzana wenda nebin, dibe ku hin kesên wek

min helbestvan nebin kêfa wan jê ra were.

Boy vê tîka min ji xwendevanên şair û helbestvan heye ku

kêmasiyên min bi temamî qebûl bikin.

Xort û keçên me yên evîndar jî hewna xwe pê binin.

Em îro di demek xeter da dijîn, zimanê me li ber têkçûyîne ye.

Gerek em bi zimanê xwe binvîsînin û bixûnin. Kêm zêde, şaş

an rast ne girîng e, lewra bi zimanê me ye. Ziman wek şîrê

dayîka mirov helal e û şêrîn e!

Her tişt boy vî zimanê şêrîn û boy azadiya gelê me!

M.Nûreddîn Yekta

Avên derya çawa şêrîn dibin?

*Rojek hemî zanyarên fizîkê civîyabûn
Digotin avên cîhanê yên şêrîn
roj bi roj kêm dibin,
roj hebe wê avên vexwarinê nemînin,
cîhan wê çi bike?
Hinekân gotin em formîlekê
ji boy avê behra bibînin,
ka em çawa dikarin van avana şêrîn bikin.
Lewra avên derya hemî tûj in!..
Liser avakîrîna santrala û
parzûnkîrîna avên tûj gelek nîqaş kîrin
lê mesref gelek li jor bû.
Hinekân gotin emê avên baranê bicivînin
li dewletan belavkî.
Lê hinekân gotin va ne mimkî e,
lewra ava baranê têr naqê him jî
mesrefek giran e!
Min destê xwe bilîndkîr û got
"Ezê ji we ra formîlek hêsan bibînim."
Gotin çawa?
Min got
"Gula min carek tûyê avên behra bike
wê hemî şêrîn bibin."*

Ax koçerê

*Heywax li min heywax li min heywax li min ax koçerê
Ezê bi xûlama bejna bilind çepilên dirêj dev û lêvên şekirî
çav û biriyên te dîlberê*

*Dîlber qûrba iro bîst û yekê adarê ezê rabim ji bo xatirê te
agirê newrozê dadim
Tûyê wisa dilê min da şirînî ezê te bi rûhû canê xwe jî nadim
Rojê destê min û delalîkê dilê min ji hev qetîya ji wê rojê
şûnva min zanîbû ezê li vê dunê bê meqsed û bê mirad im.
Heywax li min ax koçerê*

*Heywax li min heywax li min heywax li min ax koçerê
Ezê bi xûlama bejna bilind çepilên dirêj dev û lêvên şekirî
çav û biriyên te dîlberê*

*Dîlber qurba iro pêncê me temam bû minê têlê li ser têlê dida
Ez nizamim kewa min li ku ye bata serê, minê jê re derdê dilê
rezîl bigota pê ra xêber bida
Mal şewitîyê qey tû nizanî piştî çav û biriyên reş û belek
bejna zirav li welatê xerîb ezê ji xwe ra êsîr mame dî
qampêda
Heywax li min ax koçerê*

*Ax heywax li min heywax li min ax qoçerê
Ezê bi xûlama bejna bilind çepilê dirêj dev û lêvên şekîrî
çav û biriyên te dîlberê*

*Ezê bi xûlama bejna bilind çepilê direj dev û lêvên şekîrî her
du çavên qehwe rengî
Mal şewitîyê sala îsal liser te har û dîn bûmê, bûme bengî
Tû yê were ezê destê te bigirim birevînim gava tu neyê edî
îdara min nabe ezê dunya alemê da
bêjim lê biqim dengî
Heywax li min ax qoçerê*

*Ax heywax li min heywax li min ax qoçerê
Ezê bi xûlama bejna bilind çepilê dirêj dev û lêvên şekîrî
çav û biriyên te dîlberê*

Bê aqil

*Dema mirov bê aqil be
Herkes mirovê dixapîne
Mirov xweyê sozê xwe be
Xelk ji mirov re dibên dîn e*

*Rastî îro pere naqe
Ku merif ji xelkê bawerke
Ewê kêfa xwe bi te bike
Paşê piştî xwe bi te da ke*

*Ewê her du yan dixapand
Serî li her du ya digerand
Bi dev bi mêrê xwe re kenî
Ji dost re jî çav dinîqand*

*Soz tune ye ji bo mêra
Ji jina bigre dost û yara
Ku tu bi xwazî rast be bi te ra
Wê çewa xwar be ji mêrê xwe ra*

*Ecêp mam ji bona gundîyê
Ku wê bibim ser hêwiyê
Dema ku min ewê naskîr
Min dît dil ketime êzdîyê!*

Bê bextê

Xwezî min ji te hez ne kîra!

Bi dilê rast bi ruh û can!

Stûxwar hîştîm li ber dîwara,

Ji xwe re dikî kêf û seyran!

Dev bi girî dil bi xwîn im,

Wekî bilbil ez dixwînim,

Îro sê rojê min temam,

Ez digirim te nabînim!

Li ber min digirî li derva dîkenî!

Min nizanî tu ewqas bi fenn î,

Evîndarê bejna te me,

Gelo çima min dixapînî?

Ez aşiqê te me bi rastî,

Te kêr gîhandîye hestî,

Min qiyamet bi çavan dî,

Ku min ji te hezkîr bi stûyê şikestî.

Tu şîrînî wek şerbetê,

Min bi çavan dît û dil ketê,

Perîşan im li cîhanê,

Ji ber sozê te bê bextê!

Îdî li te nakîm silavê,

Li te çav reşê bejin ziravê,

Bese idî min nexapîne!

Ax zalîmê xayîn bavê.

Bê îmanê

*Delal qurba dema min te dibînim ez li jor im tu li jêr î were lê
lê were lê lê*

*Şewq û şemala te da der û dora, wekî hîva çardeşevî derkeve
ji bin ewrê reş û tarî were lê lê were lê lê*

*Tîna eşqa te ez şewitandim ez kîrim wekî xwelî û wekî arî
were lê lê were lê lê*

*Min dît kêla min rabû dikîm derêm ber derî, bikîm qêrîn
hewar û zarîn were lê lê were lê lê*

*Lê zalîma qîza zalîma roja min tu dîtî heya îro te ez nexweş
xîstim kîrim nava dest û piya, ez birindar im, bûm weka peza
guraxwarî were lê lê were lê lê*

*Dilber qurba tu nizanî îşev çi qewimî lê çi ciriya were lê lê
were lê lê*

*Minê dî xewa xweda destê kêwa digirt emê digeriyan li
daristana lê li nav devîya were lê lê were lê lê*

*Emê bi hevra diketin gilî û gazin û kêf henek û laqirdiya
were lê lê were lê lê*

*Dema min çaven xwe ji xewa şêrîn vekir, min dî ez birindar
im wekî gurê serê çiya were lê lê were lê lê*

*Dilber qurba bidî xatirê Xwedê û pêyxemberan were destê
xwe li nava destên min xe, ezê te birevînîm bavêjim deşta
Mûşê Nehya ziyaretê vê kavla Xeybiya were lê lê were lê lê
Ax zalimê êdî bese were ji ber eşqa te ez nexweş im goştê
canê min heliya were
lê lê were lê lê*

*Dîlber heyra li vê demê li vê dewranê were lê lê were lê lê
Ezê li ser danzde dewletên avrûpayê digeriyam, dewlet
dewlet li cîhanê were lê lê were lê lê
Minê dûv ra xwe berdida welatê şêrîn, ax lê Kurdistanê were
lê lê were lê lê
Ezê bajar bajar digeriyam ji Mersînê lê heya Wanê lê lê were
lê lê
Minê dûvra xwe berdabû bajarokan ji Tarsûsê lê ta Tetwanê
lê lê were lê lê
Dikim nakim qewa xwe nabînim minê xwe berda gund bi
gund digeriyam ji Xeybiya Ta Ewranê lê lê were lê lê
Geli heval û hogiran ez dikarim ji we ra sonda temam sond
bixum roja dunya ava bûye heya roja qiyametê roja axirê
zemanê were lê lê were lê lê
Tu were cara nahatiye ruyê dine yeqa weqa vê zalimê Bê
îmanê were lê lê were lê lê
(Bêja Şehribanê an Bêrîvanê jî lê tê: Tu were cara nahatiye
ruyê dine yeqa weqa vê zalimê (şehribanê-Berîvanê) were lê
lê were lê lê)*

Beqo

Beqo beqo beqo beqo!

Bese fesadiyê neqo!

Beqo dewa çi li me diqo?

Xwedê malê xirab biqo.

Beqo bû fesadê dunê,

Çi-dxwaze ji me, Mem û Zînê?

Qurro-m evîndarê hev in!

Xwedê çavê te birjîne!

Ez Mecnûn im ew Leyla ye,

Beqo li serê me bela ye,

Bese bê şerefi neqe!

Xayîni ka ji kê re maye?

Zîna min li malê rûniştî,

Ji tirsê çok lê şikestî!

Beqo fesadiya xwe kir,

Wekî kûçik bi me geztî!

Bê hiş im nizam çi bêjim?

Diqim ku Beqo bikujim!

Ji bo xatirê bejna zirav,

Li rûyê erdê xwîn birêjim!

Çiqas kûçikê dunê hene!

Bela serê min û te ne!

Xwedê bi me re dost û yar be!

Kes nikare te-j min biqetîne!

Bêrîvanê

*Bêrîvanê tu wek kûlîlkça biharê
Na na welle tu wekî çiçekça li belgê darê
Ez dizanim tu jî wek min ji destê qederê ji dilê xwe va
birîndarî
Were destê xwe li nava destê min xê te birevînim, ji te ra
sonda tamam bixum terka te nekîm hetta roja bikevim gorrê...
eman eman Bêrîvanê...*

*Eman eman eman lê Bêrîvanê
Mal şewitîyê te çav reşê lê reş kîldanê
Tuyê were emê bi destê hev du bigirin xwe bavêjin ser şehîd û
zîyaretê Kurdistanê
Emê duakî bikîjn ji Xalîqê alemê Rêbbê jorîn bila mirazê
miraz xwaza biqedîne yê min û te jî li ser îmanê... eman eman
Bêrîvanê*

*Bêrîvanê rêya zozana bişewite tev bi kerenge,
Te îro ji bextê min re li serê xwe girêdaye şara heft renge,
Xelk aşîqê malê dinê ez bûm aşîqê dilbera şox û şenge,
Kewa gozel eşqa min û te li ser danzde dewletê Awrûpayê
daye denge,
Mal şewitîye qey tû nabînî terr û canîya me çû, were destê
xwe li nava destê min xê ezê te birevînim de neseqîne rabe
lezkê wext derenge....
eman eman Bêrîvanê.*

Bi helalî

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
Kubara min lê lê

De lê lê delaliya min go tu xezal î tu xezal î

Tu yê rabe kezîyê dirêj bi ser soretê sorda bide alî,

Çav û birîyan kîl ke di ber min ra were here xwe lî ba ke bi delalî

Mal şewitîyê ezê duakî bikîm tu jî bêje amîn, belkî Xwedê
Teala biqedîne mirazê miraz xwaza êkê min û te jî lê bi helalî,

Xwezî bi wî çaxê min bidîya ku ez bibim malxwê malê tu jî,
ji min ra bibî bermalî..

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
delaliya min lê lê

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
Kubara min lê lê

Keşa gozel ca binhêre Kurdistan'a rengîn xemiliye bi van dara

Were emê bi destên hevdu bigrin biçin çiyayê Şerefdînê
derkevin zozan û wara,

Bila bê guhê me dengê bilûrvan û şivan û gavana barînê berx û kara,

Ka wer jî min re bêje wê çawabe halê me stuxwara....

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
delaliya min lê lê

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
delaliya min lê lê

Delal qurba ez diqim nakim nizanim tu çima qet fêm nakî,
Tuyê ketî xewa mirinê ewan herdu çavên belek ji xew venakî
Porrê dirêj li ser mila belav bûne tu çima qet şeh nakî
Vay ez ketim sekerata mirinê ji bo xatirê çavên belek, li vî
derdî çare nakî

Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê Werî lê lê
delaliya min lê lê

Bi hezaran

*Silav lite bi hezaran
Bi qasî qûm û belgê daran
Ne rojekê timî caran
Tu dilxweş bî delala min*

*Bi roj û şevan ez digirim
Wek mirovek lal û kerr im
Rê nabînim têda herim
Ji boy te werim xezala min*

Biba bihar

*Xwezî dîsa biba bihar li me
Min bidîya dara belgên xwe vekîra
Der û cînar derketina zozana
Min dîsa bidîya wê kêça macira*

*Ba bihata baran pê re bibariya
Berîvan bi hev re biçûna bêrya miya
Nura min bi keta navê tê da bi meşîya
Min carek bi çavên serê xwe bidîya*

*Minê bi desta bi girta emê bireviyan
Bi geriyana li serê av û çavkaniya
Rûniştina li bin sîyên darên bîya
Me bikîra kêf henek û laqirdiya*

*Dûr im destê min nagîje yarê
Hêsrê-m dibarin wekî taviyê biharê
Nav û dilê min bi hev re hatin xwarê
Kes destê min nagire nagîhîne wê koçerê*

*Li welatê xerîb ji kêwa ez kewê nêr im
Li serê dest û çiya ez di çêrim
Nîkarim bêjim ji lomê xelkê ez newêrim
Qey dîzanin ez aşiqê kêça taxa jêr im*

Bibim Bilbil

*Ci bêjim ku tu fêm bikî
ji derdê dilê min îro
bûm wek dareka îşk di payîzê de
li benda barana te me ku bibarî
dîsa zindî bibim belg û çîçekan vekim.
Ku bibim dareka hêşin
bi çiq û belgan bixemilim
gelo tu bibî çivîkek
weri liser min deyni?
te get xwest rojekê ku bibî çûçik
bihewakevî bifirî cîkî dûr
bo silavek li yarê
Lê ez?
Na wellêh naqxwazim bibim çûcîk
lê dixwazim bibim bilbilek
bifirim bi alî te va
deynim liser çiqê dara gulê
bixûnim şev û rojan
lewra ez evîndarê gulê me
evîndarê te
serxweş bibim bi bîhna baqê gulan
bi mêvaniya çend saetan
dî ber sing û berê te da
ez eva me gula min ka çi dibêji?
Dîn im an bê hiş?
diber evîna te ya wek çîçekê belg nevekîrî*

Bibuhure

*Ez insanek kerr û lal im
Min ne zar e, ne ziman e
Ez hez dikim ji dilberekê
Ez pîr bûme ew jî cane*

*Ew e ruh û ew e jîyan
Ew bi kêf ez wek miriyan
Zanim gunê dilê min tune
Lê qebahet her yê çavan*

*Zanim ku tu wek horîy î
Lê ez ketim defika te
Nexweşim ji eşqa dûriyê
Çibikim bê bext bê şefqet e*

*Ka bêj ji min re suçê min çî ne
Ji bo Xwedê ez perîşan im
Ger suçê min ji te hezkîrîn e
Bibuhure ez nezan im!*

Bihara jiyanê

*Dilber canê Şerefdîn bişewite wa bi mij e
Te bihara jiyana min bir ewrê kalîyê bi ser min da guje guje
Bê bextê te rojê heft cara digot „ez ya te me were min
birevîne an bikuje“
Gelo tu çima poşman bûy te ez kîrim dîn û harek kerrû gêje
Xwedê xirab bike karê evî dunya çiqas pis û ewqas qirêj e*

*Herçi kesên bûn sedemê min û kewa gozel belkî Xwedê ezîzê
ber dilê wan bikuje,
Ax herdû çavên wan birêje*

Bîlgînê min lawo

Lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo

Bîlgînê min lawo

*Ƙula xortê terr û can zavê dest bi hine bûka rû bi xêlê di dilê
diya te da mayo*

Lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo

Bîlgînê min lawo

*Bîlgînê min çek û rextê xwe girêda derket serê çiya ji bo daw
û doza me Ƙurda wo*

*Ƙula Xwedê bikeve derê dijmin û fesad û ceş û van
xayînawo*

*Li çiyayê Bitlîsê dor li Bîlgînê min girtin bi tevî leşkerê tirk û
van romiyawo*

Çawa bedena terr û taze dane ber top û tanga ber gulawo

Bîlgînê min serê meha Hezîranê ketî nava refê şehîdawo

Lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo

Bîlgînê min lawo

*Ƙula xortê terr û can zavê dest bi hine bûka rû bi xêlê di dilê
diya te da mayo*

*Gelî gundî malî cîrana gazin û loma ji min nekin dilê min bi
kul û bi birîn e
Heger hunê pîrsa xortê terr û can ji min dikin navê gede
lawikê min Bîlgîn e
Çek û rextê xwe girêda derket serê çiya ji bo doza Kurdistanana
rengîne
Kula Xwedê bi kul be bikeve derê fasad û cehş û vê dewleta
roma xayîne
Çawa bîlgînê min bi tevî hîjde hevalan va kuştin çek rextê
wan tev da bûne xwîne
Herçi kesê bûn sedemê kuştina Bîlgînê min belkî xêrê ji ezîzê
ber dilê xwe nebîne*

*Lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo lawo
Bîlgînê min lawo
Kula xortê terr û can zavê dest bi hine bûka rû bi xêlê di dilê
diya te da mayo*

Birîndar im

*Birîndar im birîndar im birîndar im birîndar im birîndar im
Welle derdê min giran e, birîna min kûr e de lêêêêê pîrr xedar
im*

*Îro cewabekî ne bi xêr hatî, dibên kewa te nexweş e, cihê min
dûr e, neçûm ji bonê ez nikarim*

*Ji derdê kewa gozel bi serê rê û dirba ketim li çokên xwe
dixim, bi halê xwe da digirîm û dizarim*

Heywax li min te bi me kîr.

*Kewa gozel gazî te dixim bi delalî ji te re dibêjim horî melekê
Xwedê xirab biqê evî dunya rezil, îro çawa ji min ra xwar
ziviriye çerxa qor felekê*

*Min sehkirî dibên kewa min nexweş e, birîndar e ji teniştê ji
kêlekê*

*Malşewitiyê ji min ra nebêje "kuro xema te nîne", Xwedê zane
şev û rojan xew nakim ji ber derdê te çavbelekê*

Heywax li min te bi me kîr.

Bûkê

*Ax zerîyê ax zerîyê
Nezanê lê te gundiye
Roja bavê te ne li mal be
Wê şeve tême diziyê*

*Ax dîlberê ax lê Nûrê
Ciya deyne li ber tendûrê
Xwezî bi wî roja ku ez
Bim mêhvanê te qoçerê*

*Mala Nûrê li ber çem e
Hez qirina wê dem bi dem e
Mizgîn ji te ra qoçerê
Sibê ez mêhvanê te me*

*Çûma balê di nav avê da
Millê xwe li millê wê da
Hetta em çûne wiyalî
Destê min nav memikê wê da*

*Bi hevra hatin ji zozanê da
Heval çûn em man di rê da
Hetta stêrka sivê lêda
Devê min û wê di hev da*

*Min di paxîla xwe vekir
Herdû memikan xuyan kir
Min girtibû ramîsabû
Memikê wê zare zar kir*

*Ramîsanekî dida min
Di mala xuşka xwe da
Bi qurbana bejna tebin
Hecî û axa, şêx û seyda*

Canê Canê

*Canê qurba min berê xwe daye Almanê,
Min got qey ezê çend salan bisekînim li bajarê Berlinê,
Ez nizamim şansê mi tunebû an jî bextê min bi reş bû kê berê
min daye Kôlinê,
Ezê çend meha mîna dîl û êsîra ji xwe ra mame li qampa
Durenê.
Ax de canê canê canê canê.*

*Canê canê canê canê canê canê,
Wî gundîyê biçûkê eman lê pîrr nezanê,
Bê bextê bê sozê bê qîrarê bê wîjdanê,
Serê min bi gorî umrê min bi qurbanê.....*

*Canê qurba Düren bişewite lê tev bi dare,
Canê min got welatê xelqê ji merîfan ra nabe cîh û sitare,
Canê emê bi hev re digêrîyan serê har du mehê zivistanê heta
li me bû bihare,
Welle derdê min yek bû te ye sala îsal li canê min kîr hezare.
Ax de canê canê canê canê!...*

*Canê canê canê canê canê canê,
Wî gundîyê biçûkê eman lê pîrr nezanê,
Bê bextê bê sozê bê qîrarê bê wîjdanê,
Serê min bi gorî umrê min bi heyranê.*

*Canê qurba Hukûmeta Alman berê min da bajarê
Salzkottinê,
Derdê min wisa pîrr û giran e welle nay nîvîsandîne nay
gotinê,
Ezê rabim îzna cana xwe bixwazim ji dê bavê wê bidim
qelenê wê mal û mulkê xwe yên dunê,
Heqê têra qelenê kêwa min neqê, ezê evî laşê xwe yê rizî
bavêjim ber bazarê firotinê...
ax de canê canê canê canê.*

*Canê canê canê canê canê canê,
Wî gundiyê biçûkê eman lê pîrr nezanê,
Bê bextê bê sozê bê qirarê bê wîjdanê,
Serê min bi gorî umrê min bi heyranê.*

Çardeşeviya min

Vê sibê dîsa ji nişkava tu çûy te hîştim bi tenê
Careka din xemê hundirê min zeft kîr
Di pey te re dîsa ketim nava tenetiyê
dîsa ketim nava tarîtiyê
ez bûm wek cemed li hember eşqa te
Teslim bûm bê têkoşîn û bê berxwedan
Hemî hissên min vala bûn
Ez bûm wek dareka hişk
an jî wek agirek bê duman
şewitîm şewitîm di hundirê xwe da
bûm wek ariya agirek temirî..

min xwest ez serê xwe hildim û biçim
Bi tevî van sirrên xwe yên veşartî
Ku wek agir hundirê min diperitînin

Xwezî bibama bilbilekî
min li ku gulek bidîya liser daniye
pêda bixwenda
êşa birîna veşartî eşkere kîra
Da ku bi ruh û bê ruh hemî bi derdê te bihesiyana
Bizanibana ku ez çiqas dertê evîna te dikşînim
Belku hinekan desmalek bidana min
Pê rondikên çavên xwe pagij bikim
Lê jiber kele giriye
Hîskîn bi min ketin
Gotinên min di qirika min de bûn gilok
Di şûna avek zelal de
Bi hêsrên hat şûştin rû yê min

*wek keştîkî xiravbûyî li ber derya mam
bi dehî salan bi sed salan li benda te bûm
ne tu hatî û ne jî wekî din
min qotên darên rizî himêz dikîr
dema pêlên avê ew danîn
belkî namekî ji te têda heba*

*êdî ba jî nay ku bîhna te bistînim
an jî difnê min xitimî!
Pêlên avê jî sekinin
min li wan dînhêrî û pê sebra xwe danî*

*zanî gula min ez im û yek wênek te
carnan devlîken, carnan kelogirî
dibê m ev bû evîna min
ku bi hezar salan li benda wê bûm
destek dabû min, sozek wê hebû
kanê li ku ye?*

*Dema min dengê te sehîdikîr
An jî li nava çavên belekî dînhêrî
Dîlanekê dest pê dikîr li erdê û li esmana
Stêrka dansî dikîrin
Ba dîhat, berf dîhelîya
Av radîbû, dara belgên xwe vedîkîr
Jiyaneke nû dîhat cîhanê
Daristan rengî rengî dîxemilî
Çivîkan dîxwendîn, dar dîketin silavê
Dema tu dîhatî û derbasî dibûy*

*Ka çi bêjim piştî ku tu min nabînî
Ne min, ne jî rondîkên çavên min
Ne jî şewata dilê min
Bûme wek qûmên sor li çolên erebistanê
An jî wek erdê qelîşî ji ber germê li deşta Herranê
Bi qasî ku wî erdî bêriya baranê kiriye
Ez jî ewqas hewcedarê te me Gula min
ez wek laşekî di nava qarwanê jibîrbûyan da me
Eşa xwe, kula xwe ez tenê his dikim
Ji kê ra bêjim, feryad û fîzar bikim wê bizanibin gelo
Piştî ku te ji min fêm nekir!*

*Agirê hundirê min cemedê Qutbê bakur dihelîne
Kulîlkê berfê û hebişkên zipikê
Jiber bîhna min dihelîn dibên dilopên baranê
Dema ku ez bêriya te dikim
dema ku êşa evina te dubare dibe*

*Roj ji min dixeyîdî
dema min ji te re digot “roja min”
Heyvê xwe vedişart
Dema min ji te re digot “Çardeşeviya”
Stêrkên li esmana teko teko vedimirîn
Dema ez li esmana li te digeriyam
Piştî ku tu çûy ava
Dîsa dunya min tarî bû
Her der bû şeva reş, şevên nîsanê*

*Zanî Gula min êdî ewr jî zaha bûn nabarin
Jiber hêsrên min têrdikîn*

*Dilê min peritiye lê zimanê min sekinî
Çiqas bê çare me, ewqas jî belav bûme
Pirr gotinên kevn hene li ser zimanê min
Ku wan deman min ji te ra negotibû
Niha dixwazim bêjim lê wê çi çare be?
Belê nebêjim
jiber tu ji min bawer nakî
jiber tu ji min fêr nakî*

*Xwezî bibama baran min jiyan bida cîhanê
Bikişiyama bibama leyî
Biketima serhev bibama çem, bibama derya
Bikelîyama li ber rojê,
bibama duxan, bibama helm.
Derketima esmana
Belku nêzîktirê te dibûm,
belkû zêdetir girêdayê bi te dimam.
Bila ez bibama tune, boy xatirê te.
Ji xwe ez tune me, tu heyî
Ma çi ferqa me heye, an tu en ez
Yek ji me herduk, herduk ji me yek, nebûn?*

*Te tja zanî çima ewqas bi hêrs im
Çima ewqas xeyidîme ji dunyayê
te zanî ez çiqas evîndarê te me
Lê tuyê çi dem fêr dikî gelo?*

Carnan

*carnan dibî wek
ewrê Nîsanê li esmana
dirijînî biser min de dilopên evînê
wek taviyê teyrokê li min diqîn
dimînim di rehma Xwedê da*

*carnan dûûûr diqevî
tirêjnên te wenda dibin
di pişt heft çiyayên Qaf da
dimînim wek eskîmo
di Qutbê bakur de
dicemidim bê rojê
wek surr û zemherîra di Serhed da*

*carnan dişewitînî bi eşqa xwe
diperite laşê min ji ber germê
diqelişe dilê min ji tirêjnên evîne
wek deşta Herranî di meha Tebaxê de
li ber rojê
dizarim jiber êşa evînê
diqêrim wek dayikên şehîdan
fixan diqim
dengê min diçe erd û esmana
ji derdê kê gelo?
tu!..
belê tu gula min horiya baxê Îrem
gula çiyayê Kurdistanê*

Çend Şev

çend şev bûn bê xew mam
dî xem û xeyala dîlberê de
geh li rast û geh li çep
zivirm dî nav nivînê de
da te bibînim dî xeyal de
çav vekîrî guh liser têlê
da bibihîzim dengê nazik,
leفزên ji nav lêvên şerîn bêja dîla

çend car destê min çûn ser têlê
min taqet nekîr li te bigerim
şiyarkîm ji xewa şerîn

geriyam ez carnan li sûka
carnan li daristana
çend car min himbêz kîr
tayên fidana bi xeyala te
min bîhn kîr gul û rihanan
dî şûna dêmên te da

omidên çiçekên dîl
teko teko zer bûn bi sehera sivê ra
xeyidim ji tenêtiya tariyê
dîlxweş nebûm bi derketina rojê
ev ne roja min bû, qanê roja min!
tavê da serê çiya, cîhan ruhnî bû
lê qanê tava min?
ez hêj mame dî reşaya şevê de

Çû êdî nahat

*Dilbera-m çû êdî nahat,
Li min name sebr û tebat,
Kîr dilê-m agir û şewat,
Min gellek hêsir jê-r barand!*

*Dîlber dîlber dîlberê,
Zalimê dil kevîrê,
Bi eslê xwe koçerê,
Ax bê bextê lê Nûrê!*

*Qeta ji yarê di vê rojê da!
Wekî şewata di dalê da!
Şewitandim kîrim xwelî!
Çavê min man di rêya wê da.*

*Dîlber dîlber dîlberê,
Zalimê dil kevîrê,
Bi eslê xwe koçerê,
Ax bê bextê lê Nûrê!*

*Seet li min bûn wek sal e,
Ku nay kewa çav xezale,
Piştî xwe da min çû gerê!
Li min kîrî zindan malê.*

*Dîlber dîlber dîlberê,
Zalimê dil kevîrê,
Bi eslê xwe koçerê,
Ax bê bextê lê Nûrê!*

*Canê min ciwan qal kîrî
Nexweş xistim bê hal kîrî
Goşt û hestiyê-m hellandi
Ruhê min birîndar kîrî*

De wer were

*De wer were de wer were de wer were
Kewa gozel îro li xwe kîrî fistanê sor û zer e
Ev bê bava nizamim çima ewqas şîrîn e qend şeker e
Îsal çend salê min e, li hêviya te me were te ruh ji canê min
kîrî dere*

*Îro bûme mêhvanê kewa xwe, min dî desta da elba şîr ji
bêriyê tê di xemilî
Ez nizamim qîza bê bava ji kêra çav û biryê xwe kîl kîrî
Tûncika narîn bi ser eniya geverda li her du alîya belav kîrî
Porê xwe şuştî guliyê dirêj girtî ji înadê min ra li nava millê
xwe wer kîrî
Gelî gundî malî cîrana hun gazin û loma ji min nekîn gava
çavê min bi çavê delalîya min ket hişê min çû dil xewirî*

*De wer were de wer were de wer were
Kewa gozel îro li xwe kîrî fistanê sor û zer e
Ev bê bava nizamim çima ewqas şîrîn e qend şeker e
Îsal çand salê min e ezê li hêviya te me, were te ruh ji canê
min kîrî dere*

*Kewa gozel Kurtik bişewite tev bi dar e
Eşqa qoçera min sala îsal hundirê min anî xware
Ezê ji te ra sonda tamam sond bixum tu wer cara te jibîr
naqim heya roja bîkevîm axasare*

Delala dilê min

*Tu ji min xeyîdî îro qet xêber nadî çîma?
Bîst û heyştê min temam bû çavên min li rêya te ma,
Te dilê minê nexweş tijî kirî ji kul û xema,
Lê delala nav dilê min çî bikîm tu bawer nakî!*

*Çarşem e îro bîst û heyştê me temam bû dîsa,
Ne xeberek ne cewabek te neşandî ji hêrsa,
Ez ji wek te birîndar im tu çawayî ez wisa,
Lê xezala dilê rezîl çî bikîm tu însaf nakî!*

*Bedew e ew wekî hîvê, hem wekî rojê bi nûr,
Hiş û aqil ji bo min neman, bûme mecnûnê meşhûr,
Evîndarê bejna te me, hem bi nêzîk hem bi dûr,
Bê însafê dikîm nakîm, tu vê mesafê nêz nakî!*

*Te li ber çavê min reş kirîye hemî jinên cîhan,
Meh û salan şev û rojan ji bo te dikîm fişan,
Dixwazim ez te bibînim, tu ji min re bibî xuyan,
Lê şepala bêbext û soz çî bêjim jî tu fêm nakî!*

Delalê

*Min dîlberek dît di vir da
Wek min bi tenê di nav garwir da
Dema berê xwe da valî
Bi wan çavên reş awir da*

*Navê dilbera min delal e
Bi herdu çavan wek xezal e
Wê ji derde tenêtiyê
Pirr got û hem jî dînale*

*Ka wer carek te bibînim
Bejn û bala te çawa ye
Ger bi dil-can biecbinim
Ruh û can tevda feda ye*

Derdê Hêwiyê

*Delal heyran bejna te zirav e ji dara biyê
Ezê bi xulama bejn û bal û timtêla te zeriye
Xelk aşiqê mal û halê dunê ez bûm aşiqê te zarokê te gundiyê
Tu dizanî va bû çen salê vî rebenî qediya ji bona te miriye
Lê zalimê şev û rojan dizarim ji derdê te êzdiye
Ka wer ji bona herdu dilan herçar çavan çend salan qebûl
bikê qara vê hêwiyê*

*Gelî heval û hogiran heke hunê pirs a eslê kewa min dikî
kewam bi eslê xwe macire
Xwedê xirav bikê mala dewleta romê çawa destê min û kewa
min ji hev qetandin ez li welatê xwrîb bi tenê ew ne li vir e
Heke hunê pirs a eşqa wê dikî eşqa zalimê di dilmin de wekî
pêteka agire
Gazin û loma ji min nekîr, derdê min giran e birîna min pîr
kûr e
ez çî bikîm ez bi tenê me, min hal nîne û ew zalima jî min
dûre
Heke hunê pirs a delala min dikî yeqa bejin bilînda nav
qendîla çavbelekê birî qeytan e bi navê xwe menşûre*

Derdê Sorgulan

*Min gulek dît li nav gula
Dişewtîne hemî dîla
Dimirim ji derdê van sorgula
Çi bikîm feleka-m xayîne.*

*Gulên xelkê bi made ne
Gula min tim devliken e
Ruh bê qalib, cesed bê ruh
Pirr serxweş e, ne ku dîn e*

*Mest bûme ji eşqa mehbetê
Çavan nedît lê dil ketê
Yarên xelkê bikêf û henek
Ya min biderd û kul û kîn e*

*Hewar ji destê eşqa dîla
Barek giran da ser mila
Ez dixûnim wek bilbîla
Digirîm lê ew min nabîne*

Derdê xwe

*Şevbaş li te xezala min
Tîm dilxweş bî delala min
Xelk û alem tev zewîcîn
Ax tu nebûy bermalya min*

*Ax bextê min qedera min
We reşkirî jiyana min
Gava derdê xwe ez bêjim
Narvîsîne qelema min*

*Wey Xwedêyo ev çi derd e
Gelo rojek wê dev ji min berde
Min bighînin çavreşa min
An min bîkuje wê bi ser de*

*Wey Rebbiyo ev çi jane
Birînên minên kevn hildane
Çavê mî bi çavên reş naqevî
Dunya li min bû zîndane*

*Wey Xwedê yo ji kê bîkîm gazin
Ji te tiştên pîr naqxwazim
Pîr xedar im belengaz im
Ji derdê rînda dest bi bazin*

*Ji bo Xecê ez Siyabend im
Ji bo Şêrîn ez Ferhad im
Wekî Mecnûn di çolê da
Bi zarîn û bi feryad im*

Wey Rebbiyo ez kerr lal im
Dem û gavan ez dikalim
Li zîndanan wek Memê Alan
Ji bo Zînê ez dinalim

Dikim qêrîn her dem û gav
Ez heliyam bûm av û xunav
Çavnêrîne benda wê mam
Ji min ra bişîne yek silav

Gelo carek bibînim ez
Rînda dunê bûka Medya
Evîndarî bi derd û kul e
Hercî nezan nedîn dunya

Wey Xwedêyo ez çi bikim
Ji kê re bêjim derd û êşê
Kewa min çû ji xelkê ra
Xwe da ber darê dergûşê

Naxwazim sehbiqim dengan
Xwe kerr bikim ji herdu guhan
Naxwazim kesî bibînin
Xwe qor bikim ji herdu çavan

Kesên evîndarî nedîn
Bila li min loma nekin
Çi zanin ew jana dîlan
Bi nezani derman bikin

Derman

*Îro ji derdê dîlberê,
Bûme serxweş û serserî,
Çavên belek lêb şekerê
Tu derdê min baş dîzanî*

*Rînd î delal î pispor î
Xerîb im ez tû ji min dûr î
Wek hîv û rojê bu nûrî
Ez dimirim lê tû çawanî*

*Koçera min delala min
Çavên belek xezala min
Xwezî bibay bermalîya min
Ez çi bikîm tu nezan î*

*Rû girtina bi melesê
Ez kîrim gula melisî
Çima tu halê min napirsî
Zanim ku tu bêwîjdan î*

*Min pîr got tu nakî îman
Min got em herin tu nakî ferman
Birîn kûre nîne derman
Ka bê-j dermanê me kanê*

*Nîza-m çima get pîrs nakî
Ji bo derdê min hewes nakî
Min ji vî xemî xilas nakî
Tu yî doxtora vî canî*

*Vê xurbetê lî me çi kîr
Cerg û dilê me parçe kîr
Te lî vî eşqî çare nekîr
Ji birîna min ra tu dermanî.*

Dîlber kanê?

*Îro dîsa nexweş im ez
Birîndar bûme ez îro
Birîna min bê derman e
Niza-m dîlber kanê îro?*

*Gelo dîlbera min kanê
Wê dunya kîr li min fanî
Tenê hîştîm li dewranê
Sebir nakîm ku ez îro!*

*Yarebb Tu bide min sebrê
Hetta roja bîkêvim qebrê
Nedî wê kul û qedêrê
Wê da min pîrr zehmet îro.*

*Te bi dîlberê nekîr şahî
Ji hevalan şûnva mayî
Di nexweşxanê da paldayî
Bi derba qoçerê îro*

*Eva eşqa jibîr nabe
Hetta ku dunya avabe
Li vî derdî çare nabe
Doxtorê dunê bên îro .*

Dilê dîn

*Kewa gozel dilê min ji dila dilekî dîne
Mal şewitîyê te li me derbas kîr çend zivistan û çend havîne
Te her roj xêber dişand digot kurro lawîkê were min bi revîne
Tuyê îro çima poşman bû yî qey tu nizanî dilê min ji te re bi
evîne*

*Kewa gozel Xwedê xîrab bike Şerefdîn bişewite bi av û çeme
Mal şewitîyê te ji min re sond dixwar digot kuro lawîkê ez
ya te me
Te çewa bext û sozê xwe danî te dilê min tijî kîr ji kûl û xeme
Ma qey hun nizanin ji birina min ra ew zalîma tenê melheme*

Dîna min dîna min

*Lê lê dînê dîna min dîna min dîna min dîna min dînê
Lê lê dînê hîne bi min hîne, dînîka min hîne bi min hîne
Ax de te yê bi vi aqilê xwe li me derbas kîr çend zivistan û
çend havîne
Xelk û alem bûn aşiqê bejin bilînda çav bi kîla, bisk bi têla,
çepil dirêja, ez bûm aşiqê yeqa dîn e.
Welle şansê min tune ji guhan kerr e min sehî nake, ji qelb û
dilê xwe qor e min nabîne
Ez çî bikîm feleka bêbext ji min ra xayîn e dîna min dîna min
dîna min dînê, sebr û bîhna min dînê*

*Lê lê dînê Ameda şewitî payîtext e, Amed bişewite payîtext e
Ax lê dînê dev ji galgala berde dem boriya nema wexte, şev
boriya nema wexte
Xelk û alem bûn aşiqê bejin bilînda, çav bi kîla, bisk bi têla,
navqendîla çepildirêja, ez evdalê Xwedê bûm aşiqê yeqa ji
aqilê xwe kême sê-çar texte
Ez çî bikîm şansê min tune, feleka xayîn ji min ra bêbext e,
dîna min dîna min dîna min
ax dîna min dînê, sebr û bîhna min dînê*

*Dîna min dîneka baş e
Li xwe kîr dêrê qumaşe
Ez dînê çûne dalê
Em geriyan kaş bi kaşe
Em runîştin li nav giya
Bi kêf henek û laqirdiya
Bi we dîna bê aqil ra
Dema me pîrr xweş boriya*

Dr. got

Îro li doqtor bûm

Çendek bû pirr bê hal bûm, îro çûm Dr.

Ez miayene kirim ka sedemê bê haliya min çiye?

Piştî filmê dr. ma ecêb, got ku tu çawa dijî?

Min got çima?

Got va cara yekem e em dibînîn ku mirovekê bê dil dijî,

dî nava te de dil tune ye, bê haliya te ev e!

Ez keniyam min got doqtor min dil heye,

lê ne bi min re ye, gula min girt û bir,

her çiqas dûr be jî, jîyan dîde laşê min,

wekî rojê li esmanê hefta çawa jîyanê dîde alemê!

Durûyê!

*Dilber îro min aciz kirî,
Zalim canê min zer kirî,
Wê qiymeta xwe ya mezin,
Ji ber çavê min rakirî,*

*Çima tu ewqas şirîn î,
Gelo çima min dixapînî,
Her roj tu min di behecînî,
Belkî tu xêrê nebînî!*

*Dev bi girî dil bi xwîn bî,
Şahî nebîn tim bi şîn bî,
Ling bikîşe ji çavan qor bî,
Muhtacê ber destê min bî.*

*Te ji vî rebenî çi xwestî?
Bi hellî bi mînî hestî,
Perîşan bî li vê dunê,
Dûv re bi kevî ber vî destî*

Eşqa te!

*Ax Dîlberê te lal kîrim
Melûl û hem bêhal kîrim
Ji nav hevalan ez rakîrim
Ji eşqa te bê hal im ez!*

*Bejna bilînda wek çinar,
Cergê min kîrî birîndar,
Dikim fişan zarîn hewar,
Ji eşqa te bê halim ez!*

*Tenê mame ez ji dayê,
Xerîb geriyam li dunyayê,
Bê te sebra min qet nayê,
Ji eşqa te bê halim ez!*

Eyşanê

*Eyşan yekê rindîkê lê lê lê Eyşanê
Bi eslê xwe jî tirkê lê lê lê Eyşanê
Birê de diçe difirîkê lê lê lê Eyşanê
Ji xelkê re bi şefqete lê lê lê Eyşanê
Ji min re bi kîr û rikê lê lê lê Eyşanê*

*Ax de lê lê lê lê lê Eyşanê
Çavreşê reşkildanê lê lê lê Eyşanê
Biryên wê wek qeytanê lê lê lê Eyşanê
Ji xelkê re bi merhemetê lê lê lê Eyşanê
Ji min re bê wîjdanê lê lê lê Eyşanê*

*Sûretên wê wek şevanê lê lê lê Eyşanê
Hingiv dibare ji devanê lê lê lê Eyşanê
Xew hêramkîr li şevanê lê lê lê Eyşanê
Heyrana tenik lêvanê lê lê lê Eyşanê
Bibe bûkê ez bim zava lê lê lê Eyşanê*

*Ax de lê lê lê lê lê Eyşanê
Çavreşê reşkildanê lê lê lê Eyşanê
Biryên wê wek qeytanê lê lê lê Eyşanê
Ji xelkê re bi merhemetê lê lê lê Eyşanê
Ji min re bê wîjdanê lê lê lê Eyşanê*

Ez nakîm

*Lê dîlberê dîlberê,
Ez heyranê dîlberê,
Delalê lêb şekerê,
Ez qurbanê dîlberê,
Nesekîne li wê derê,
Ez heyranê dîlberê,
Bê soza qîza kerê,
Ez qurbanê dîlberê,*

*Na welle na ez nakîm
Welle bîlle ez nakîm,
Nexweş im ez dîmirim
Bê Ferat sebir nakîm,
Ne mirim te digirim
Bê te îdare nakîm,
Li vê dunê bê mêr bim
Bê Ferat mêra nakîm*

*Dîlber yekê bedew e,
Evîndara min ew e,
Bext û sozên te dan min,
Tev derketin derewe,
Tu axa ez qole bûm,
Aşiqê bejna te bûm,
Meh û salan min qar nekîr,
Şev û rojan li bal te bûm.*

*Na welle na ez naqim
Welle bîlle ez naqim,
Nexweşim ez dimirim
Bê Ferat sebir naqim,
Nemirim te digirim
Bê te îdare naqim,
Li vê dunê ez bê mêr bim
Bê Ferat mêra naqim*

*Min te dîtî li zozanê,
Heyrana girêdanê,
Ji herd û sûretên sor,
Tu bide ramûsanê,
Dikim naqim tu nayê,
Zalimê bê wîjdanê,
Xwedê mirazê me bike,
Li ser îman û Qur'an'ê.*

*Na welle na ez naqim
Welle bîlle ez naqim,
Nexweş im ez dimirim
Bê Ferat sebir naqim,
Nemirim te digirim
Bê te îdare naqim,
Li vê dunê bê mêr bim
Bê Ferat mêra naqim.*

Ez Rebenim

*Nava gund û warê me bişewite hemî deşt û çiya,
Serê her du mehê vê biharê minê destê dîlbera xwe girtî emê
derketine serê rêya,
Emê çend şeva bûne mêhvan û misafirê misliman û van
êzdiya,
Kula Xwedê bi kul be bikeve derê, der û cînar û gundiya,
Çawa destê dîlbera min girtin birin, destê min û kewa gozel
ji hev qetiya,
Xwezî bi îman û Qur'an'ê, min dîsa delalîka dilê xwe bidîya,
Bila Ezraîl bata ruhê min bistenda ezê bibama mirîkî ji
miriya,
Xema min nîne bila cenazê min biçûya deşta Mûşê nehya
Ziyaretê kavla Xeybiya,
Li ser cenazê min top bûna qîz û bûkê mehelê bi tevî
jinebiya,
Bila bikeşa guhê min dengê kewa gozel sertacê horiya ez
rebenim ez rebenim...*

*Xwedê xerab bike nava gund û wara bişewite xweş caddê ye,
Gelo nayê bîra te hemî cî û mekanê kêf henek û laqirdiyên
min û te ye,
Kewa gozel roja min û te xatir ji hev xwestî, min dî hêsir ji
çavê te da nabarin êdî min dizanî li vê dunê ez bimirim jî, ji
bone te bê faydeye,
Ax bê bavê ezê ji te ra sûc û qebeheta nabînim, a kum sehkirî
dibên eslî bavê te ecem e, yê diya te file ye
Ji bavê berê da ez dizanim tu bexç û soz û qewl û qirar ji
bona we tune ye ez rebenim ez rebenim.....*

Ez xapandim

*Dilberê ez xapandim,
Serê rêya ez gerandim,
Çend mehê me qediya,
Ewê ez şewitandim.*

*Ax dîlber dîlber dîlber!
Dîlber çiqas delal e,
Nizane ku Şêxo ê wê,
Ji bo çiqas dinale?*

*Nizanim çima derew kîr,
Eşqa dilê min rakîr,
Paşê piştî xwe da min,
Malê li min xîrab kîr.*

*Ax dîlber dîlber dîlber!
Dîlber çiqas şîrîn e,
Cergê min tijî kîrî,
Derd û kull û birîne.*

*Nav nabêjim gune ne,
Çend nişanên wê hene,
Yek serê memika ne,
Yên din li bin çoka ne.*

*Ax dîlber dîlber dîlber!
Dîlber çiqas zalim e,
Dilê min tijî kîrî,
Derd û kûl û eleme.*

Fedî

*Lolo kuro navê min Sorgul e
Gede lawikê min wekî roja li asîmanê hefta di çilwile
malşewitiyo wele hezkîrana te janê xistî nava dile
lo bêbexto êdî were min ne sebrê lo ne tehemmule*

*Lolo kuro dîsa hatî roja îdê
gede lawikê min li welat ez li xerîbiyê li vî erdê
malşewitiyo wele eşqa te li ruyê min nehîşt eyb û fedî
xelkê hezkîrê xwe sitendin gihîştin mirazê xwe min gede
lawikê xwe têr nedî*

Fêmnake

*Ez çi bêjim çi beyan kim
Sirrê dilan ez iyanîm
Derd û xema eşkerakim
Kes ji halê min fêmnake
 Me dest da hev em çûn baxa
 Ez kole ew mîr û axa
 Dilê min girt da ber daxa
 Kes ji halê min fêmnake*

*Kes nizane sirrê dilan
Derdê eşqa çavxêzalan
Ger binalim mehî û salan
Kes ji halê min fêmnake
 Aşiqê rinda Meda me
 Evîndar im mubtela mê
 Ger bibînim can fedame
 Kes ji halê min fêmnake*

*Mecnun im ez li sehrayê
Digerim ax li Leylayê
Bibînim bejn û balayê
Kes ji halê min fêmnake
 Li dil da tîrekî dijwar
 Serê tîrê di dil çû xwar
 Dikim fişan zarîn hewar
 Kes ji halê min fêmnake*

Feryad

*Hukûmeta romê destê min û delalîka dilê min ji hev qetandî
Min got qey wê min ji bîr bike, çend roj şûn va ji min ra
silavek şandî
Ewê rojê şûn va min zanîbû ewê mala min û xwe bi hev ra
şewitandî.*

*Sala îsal ez bûm aşiqê wê kêça macira
Halê min xirab e ez bi roj bi şev digirîm çavê min xalî nabin ji
hêrsira
Ê kû hatî serê min abdalê Xwedê bila ne ê serê hirç û gura.*

*Dîlberê te çawa terkî min kîr li welatê xerîb ez hîştim bê kes
û bê eqreba
Hetta kengê emê wiha bin xwezî rê kî rohnî li me veba
Xwezî bi îman û bi Qûr'an'ê bila mirin hebûya derdê dilê
rezîl qet tuneba*

*Rêya gundê we bişewite ber bi pale
Îro pêncê me tamam bû ez têlê li ser têlê didim kêwa min
nayê serê nizanîm kêwa min kû da çûye gelo ne li male
Xwedê zane bê dîlbera xwe îdare nakîm welle ez nexweş im
min ne hale*

Gelo

*Te ef nakîm na welle,
Te bê hal kîrim bîlleh,
Dema ezana melle,
da gello têmê bîra te?*

*Gezmax û seyrana te,
Bê lastîk hatina te,
Hatim dest û lingên te,
Gello têmê bîra te?*

*Ewan sondê te xwarin,
Piştî seyrana dawîn,
Min kîr fixan û zarîn,
Gello têmê bîra te?*

*Ew navê te li min danî,
Tu bi fê'lê xwe dîzanî,
Te heya me tev hilanî,
Gello têmê bîra te?*

*Gava derkevî eywanê,
Li serê rê ya li seyranê,
Dema bi kevî tîranê,
Gello têmê bîra te?*

*Nanxwarina li ser masê,
Çêbîkî kartol û masî,
An jî tu yekî ramîsî,
Gello têmê bîra te?*

Gul Çiye

*Herkesek ku ji yekê hezdikê
jê re dibê gula min,
lê hemî derewa dikin.
Ji xwe li cihanê yek gulek heye,
ew jî gula min e!...
Gulên xelkê bi rojê belgan vedikin
lê gula min bixwe Roja delal e!..
Ku tav û germaya wê tunebe
gelô wê jiyan çawa bimeşe!*

Gula Mela

*Nexweşî min sehkirî, lê dîlberê dîlberê
Wê şevê-m xew nekîrî, ez heyranê dîlberê
Bese tû xema neke! lê dîlberê dîlberê
Te canê me zer kîrî. ez heyranê dîlberê*

*Koçerê xeber da min, lê dîlberê dîlberê
Agir berda nava min, ez heyranê dîlberê
Sist bû çok û millê min, lê dîlberê dîlberê
Çi jan bû da dilê min, ez heyranê dîlberê*

*Ez hatime ber derî, lê dîlberê dîlberê
Min dî li min dinêrî, ez heyranê dîlberê
Şev û rojan em digrîn, lê dîlberê dîlberê
Me xelas ke lê zerî. ez heyranê dîlberê*

*Ez Ferhat tu Şirîn î, lê dîlberê dîlberê
Tu ruh û canê min î, ez heyranê dîlberê
Zanim tû mereq dikî, lê dîlberê dîlberê
Dil bi kull dil birînî. ez heyranê dîlberê*

*Ez Mecnûn tu Leylayî, lê dîlberê dîlberê
Tu gula dilê Melayî, ez heyranê dîlberê
Çi bixwazî tu hêjayî, lê dîlberê dîlberê
Mela ji te-r can fedayî ez heyranê dîlberê*

Gula min dermanê Dila

*Îltifat nakî bi çend rojane
gula min gula min dermanê Dila
yek lehzeke bê te mirin û jan e
gula min gula min dermanê Dila*

*cemala te ji min re seyrana dil e
gula min gula min dermanê Dila
dûrbûna te ji min re pirr derd û kul e
gula min gula min dermanê Dila*

*wer bibe Loqman min derman bike
an bibe cellad li qetlê ferman bike
bibim Îsmâîlê te min qurban bike
gula min gula min dermanê Dila*

*bi agirê hîcranê min ne şewitîne
dîla bi axîn û nalîn û zarîne
keremke bi mehzûnî min nezvirîne
gula min gula min dermanê Dila*

*çiqas xwe veşêrî ez te dibînim
di nav dilê xwe de ez te hiltînim
roja tunebî wê dem bi şîn im
gula min gula min dermanê Dila*

*pirr bûn birînên min wer bibe tebîb
li warên xelkê min neke xerîb
ji baxên xwe re min bike endelîb
gula min gula min dermanê Dila*

Gula Şêxo

*Rinda çîyayê Şerefdîn im,
Ez tu kesî naxapînim,
Sozen bidim ez pêk tînim,
Ez gula dilê Şêxo ê dîn im.*

*Kevoî im ji deşta Mûşê,
Bîhn xweş im weka menekşê,
Roja Şêxoyê xwe nebînim
Ji ruh û canê xwe tev dêşem.*

*Kevoî deşta bê dar im,
Her roj ji bo te dizarim,
Dilê min her bi te va ye!
Ji tirsê bavê xwe niqarim*

Gula min xeyîdî

*Gula min xeyîdî ji min
Li min bê wicdaniyê kîr
Li ger û kêf û li dîlanê
Tanê hîştîm li cîhanê,*

*Roja zivîrî ji gerê
Pacê vedîke dînhêrî
Ku mesaja dîla nebe
Made, kêr û rîk tev dibe*

*Nizan ka min çî go wilo
Di nav xewnên wê de gelo
Silavek nade bi rîk e
Hesreta min jîbîr dîke*

*Ax lê canê ax lê canê
Te zalimê bê wicdanê
Îro roja îniyê ye
Rojek taybet ji bo me ye*

*De ka werê vê êvarê
Ez qurbanê lêlê yarê
Ku tu nebî cîhan tarî
Wekî şeva baran barî*

*Bese bibhîze zarînê
Şev û roj ax û nalînê*

Gulê çû

*Gulê tu çûy ji nişkava
Bê xatir û bê silava
Liber guhê min bû gurîn
Deng ji zalimê hat birîn*

*dimrim ji bona te Gulê
Ev çi eşq bû te da dilê
Ez li dora te dîgerim
Wek bilbilê li dor gulê*

*tenê hîştim û ew jî çû
min niqarê ku bidim dû
Evîna te li cîhanê
Nehîşt li min tu av û rû*

*Eva çi bû te li min kirî
Heroj bi axîn û girî
Gelo sûcê min çi heye
Ji bilê min ji te hezkirî?*

*tu heyat î tu jîyan î
ji derdê min re tu derman î
te min kir evîndarê xwe
çima ewqas bê îmanî*

*carnan dibî wek biharê
car ezraîl î dikûjî
car dibî dayikê dilsoz
carnan vampîrê xwînmij î*

Gulamin gulo (Audi 4)

*Çi dem û dewran li me bori
Di rê û dirban de*

*Çi hevalîkî xweş bû
Bi roj û bi şev bi te ra
Em wek du heval bûn
An wek du evîndara*

*Pirr xweş bû hevaliya te
Me gellek hene bîranîn
Li bajarên Ewropa*

*Bê bexta felekê
Destê me ji hev qetand*

*Vê sibê cara dawîn bû
Hevaltiya me
Tu çu bê xatir xwestin
Dil ma bi te ve
Çav di rêya te de*

*Wek parçek ji laşê min qetiya
Wek nîv mirov im di xema te de*

*Wî navê şîrîn li kesî naqim
Dil rehet bî tu gula min
Gulooo !..*

Gundiye

*Gundiya min tê ji qaniyê,
Bi cêr û misîn av haniye,
Dil ketim keça gundiye,
Çi bikim dîlbera min durû ye.*

*Gundiya min ji bêryê tê,
Dêrê belek çî lî bejnê tê,
Were em destê hev bigirin,
Bi hev re biçin mala metê.*

*Bejna zirav çî kubar e,
Ji eşqa te heyhewar e,
Eşîr lî min bûn neyare,
Ji dest gundiya xeddare.*

*Gundiya min tu nayê çîma,
Çavê min tim lî rê ya te ma,
Nexweş im ez te dixwazim,
Zer bûme wek mûm û şîma*

Halê min bibîn

*Ez çî bikîm ji xwe û ji te,
Te ne rehîme ne şefqete,
Dûr im niqarin bê m bal te,
Tu wer halê-m bibîn dîlber!*

*Guliyên dirêjên bê wefa,
Min ji xwe-r têr pê nekir sefa,
Te ez kuştim bi sed cefa,
Were halê-m bibîn dîlber!*

*Bê te jîna min tuneye,
Dilê min her bi tevaye,
Hêsrê çevan ji bo te ye,
Were halê-m bibîn dîlber!*

*Zanim dîn im ji bona kê,
Evîndar im ji bo çavên wê,
Hêj ez nemirime zalimê,
Were halê-m bibîn dîlber!*

*Ruhê min ji te re feda ye,
Canê min qurbana te ye,
Çavê min tim li rêya te ye,
Were halê-m bibîn dîlber!*

Haylo li min

Kewa gozel îro fistanê belek li bejna xwe kir,
Xwe da nav derî, bi dilê şewitî li min mêze kir,
Xwedê zane sala îsal, min ji dilbera xwe pirr hez kir,
Ez çî bikîm şansê min tune bû Xwedê Teala ji min ra nesîb
nekir.

Gelî hevala hun dizanin dilbera min rind e, bê qisûr e,
Heke hunê pirsî eslê kewa min dikî kew min bi eslê xwe jî
koçer e,
Kewa gozel tu dizanî mîslîman lime stariyê nakî were ezê
bi destê te bigirim te birevînim, bavêjim dewletekî ji van
dewletê gawire.

Koçera min tu yî ji min ra sebra dîla,
Malşewitîyê te sing şênê jî baxçê gula,
Qey tu nizanî kes li me stariyê naqê were ezê bi destê te
bigirim birevînim bavêjim ber bextê fila.

Sala îsal ez kuştîm bûka koçera,
Zalîma qîza zalîma ez hellandîm wek mûm û çîra,
Were ezê dua kî bikîm tû jî bêje amîn, xwezî mêrê te bimira,
Serê her du mehê vê pahîzê Xwedê Teala te ji min ra nesîb
kîra.

Lê lê dilber qurba êvar e, lê roj li ava,
Ezê bi heyrana bejna bilînd çepilê dirêj ewan dev û lêva,
Xwezî bi îman û bi Qur'an'ê bi wî roja ku ez bibînim tu bibî
bûk ez jî bibim zava.

Hêsrên Çavan

*Ne şair û ne dengbêj im
Te hiş birî ez kerr û gêj im
Hêsrên ji çavên xwe dirêjim
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Ez çî bikîm ji vê heyatê
Çî bikîm bi mal û serwetê
Sonde dixum bi Tewratê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Ax ax dîlberê ax macirê
Birîndar im ji ber vê tîrê
Sonde dixum bi Zebûrê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Ax dîlberê çav xezalê
Rîndê bedewê delalê
Sonde dixum bi Încîlê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Ax koçerê bê wîjdanê
Çawa kîm ruh û vî canî
Sonde dixum bi Subhanê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Ez çî bikîm bi vê dunê
Ku bê te mame bi tenê
Sonde dixum bi Qur'an'ê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

*Çî derbek bû te li min danî
Li welatê me Kurdîstanê
Bi sê telaqê jin berdanê
Hêsrê-m ji bo te dibarin*

Hewar Hewar

*Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar
Mal şewitiyê te bi destê evîna xwe nexweş xistim kîrime
birîndar*

*Xelkê ji xwe ra li vê dunê jiyaneke xweş dîtîn bi tevî
hezkeriyên xwe û dost û yar*

*Çavê min li rêya tene tu wer cara tu der li min nakîjin cîh û
sitar*

Te yê sala îsal nexweş xistim bi saxî kîrime axa sar

Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar

*Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar
Hewar hewar*

Ez gune me

Eva bû serê 14-15 mehan tim bi roj û şevan li benda te me

Hesrea dilê min e ku rojekê bi dilê xwe rûnêm wa li cem e

*Tu nizanî bûm aşiqê bejna bilind, çepilê dirêj nava zirav her
du çavên bi surme me*

Ji birnên min ra tu melhem e

Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar

*Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar Hewar hewar
Hewar hewar*

Bê lome be

Agirê te kiryi dilê min belku di hundurê te be

Wisa di dîlda bimîne tu wer cara jê kêm nebe

Çiqas dem zeman derbas bibe roj bi roj lê zêdebe

*Ezê duaqî bikim belku Xwedê kîlîtê li devê te xe, ji min bêtir
li tu kêşî venebe*

Heware

*Heware ax li mim heware!
Min ne sibe ne êvar e!
Hiş û aqilê min nema!
Hundirê min hatî xware!*

*Min ne zar e ne zimane!
Keseq derdê min nizane!
Zarîna min çû esmane,
Çi bikîm dîlber bê wijdane!*

*Ji kê re bêjim derd û halê!
Kulla ewê çav xezalê!
Ji min re sozekî dabû!
Esîr hîştîm dam ber malê.*

*Were taqetê min nema!
Çavê min li rê ya te ma!
Nizanim çima bawer nakî!
Hellîyam ez wek mûm û şîma*

*Ev çi jane da dilê min!
Ka wê çawa be halê min!
Erd û esman tev digirîn!
Ku tu na ê ber çavên min!*

Heyla wahê

*Mala kew a gozel li cîhkî tîk e,
Îro ji min re bi kî n î bux z û wa bi ri k e,
Di ber min re diçe û tê difiri ke,
Çepilê xwe bi ser min da dihecîne û liba di ke,
Dev û çava di qelêşe ji min re îşaretê di ke,
Ez nizamim va zalîma îro daw a çî li min di ke?*

*De hey la wahêêêê hey la wahêêêê hey la wahêêêê
Dilberê qurba minê ji te re çav rijiyayêêêê
Dikîm nakîm bê te sebra min qet nahêêêê
Tuyê wisa dilê min da şîrînî ezê te nadîm bi kurr û qîza bi
xuşk û bira bi bav û dayêêêê,
Na welle te nadîm bi ruhê şîrîn û bi hemî dunyayêêêêê
Îsal çar salê min tamam bû ez li hêvîya teme ax zalîmê
dîlgawirê tu çîma na êêêêê?*

*Min nizan bû derdê dilê rezîl ewqas zor e,
Minê ji te re sonda tamam sond xwariye ku ez terk a te nekîm
hetta ku umrê min tev bi bore,
Eger hûnê pîrsa eslê kew a min dikî n, kew a min bi eslê xwe
koçere,
Navê delîk a dilê min Meşhûr e !*

*De hey la wahêêêê hey la wahêêêê hey la wahêêêê
Dilberê qurba minê ji te re çav rijiyayêêêê
Dikîm nakîm bê te sebra min qet nahêêêê.....
Nakar at*

Hîma ewqas bû?

*Hîma ewqas bû evîna te
bi yek firtonek wêran dibû?
tu nebûy ya ta mirinê bi evîn bay ?
bi çend gotin û bi rêwîtîkî diqedîya?*

*bi qasî erdê giran, bi qasî esman fireh bû eşqa me
ka qiyamet raba neditemirî çira me
ka ronaya min. Çû ava roja min, dîsa mam di tarîtiyê de*

*ez azad bûm bi te gulê, bi azadî dijîm bi evînê
kîjan bextereş li zincîrê dixê eşqa me?
kî ye li qeydê dixê dilê min
evîna min mezintirê ji qeyd û benda ne!*

*ne bo demek bû ne jî macerak bû
ne kêfxweşî û ne jî dîlxweşî bû evîna min
belkû eşqa herî mezin e
wek rojê gurr dibe ronaya wê bi agirê xwe!
min ronî kîr eşqa te
bi ehda min ya ezel an bi mirin an bi zindî
tu ya min bî gula min*

*tu zendîkî ku bitemirê agirê di dilda bi yek derewek!
tu ruhek bûy di laşê minê rizî da
min serîkî heye di vê rê da
an dimrim an jî digrim te Gula min*

Jarî (Yar bûye jarî)

*Digerim nabînim yara min li ku ye?
Kes ji min napirse halê min çiye?
Dimirim ji derdê wê kewê durûye,
Xew li min heram e roja min bû jarî.*

*Nabînim dîlberê halê min pîrr xirab!
Daye min îsal wê hezar û yek ezab,
Vî Nûro yê reben Tu xîlaskî ya Rabb!
Vexwarin heram e, xwarin bûye jarî,*

*Min rê ya xwe şaş kîr digerim nabînim,
Min bawer kîr ji wê gelo qey ez dîn im?
Naşîne silavekî ku ez hilînim!
Digrîm bi halê xwe hêsrê-m bûne jarî.*

*Min navê perîşan bim ez wekî cara,
Min pîrr kîşand ji destê van dost û yara,
Wê çawa be halê dilbirîndara?
Naxwazim bila ney yar bûye jarî!*

Keça çavreş

*Tu ji min dixeyîdî çima?
Gerek tû ji min ne kê loma,
Çi kirî te bi min kirî!
Te ez kirim estîre roma.*

*Ji te hez dikim dizanî!
Lewra ewqas bê wîdanî,
Êdî taqetê min nema,
Tu ji min ra qidûmê çokanî.*

*Welleh ji te pîrr hez dikim,
Nîqarim terqa te bikim,
Rojê li ber çavê min nebî,
Dikim dunê xirab bikim.*

*Serê rêya ketim û dimeşim,
Ji bo koçera xwe ne xweş im,
Xelk aşiqê malê dunê
Ez kolê bûka çavreş im.*

Kewa min

*Kewa min çav belek e,
Bese derdê min gelek e!
Dema ku diçim balê,
Cerg û dilê min kul dike.*

*Gava jê dûr dikevim,
Teze bi xwe dihesê,
Êdî bi desta naqevim,
Dil bi kul û merez e.*

*Dixwazim dilber rast be,
Ji derd û kulan xilas be,
Ku bibe bermalîya min,
Wê ji min re pirr bi naz be.*

*Dilbera min esmer e
Eşqa wê wek agir e
Bext û soz wê virr e
Bê bextê zû dizvire*

*Bide min bext û soze
Ku ez bi te bawer bim
Bibin xwedan yek doze
Ji te re can feda bim*

*Dilberê çav ne lidere
Bi eslê xwe koçere
Ji min ra gelek dûre
Bi navê xwe Menşûre*

Keyf û henek

*Dilber qurba dilê min û dilê betê eman eman
Xwezi par vî wextî me bi destê hevdu digirt, em bihevra
diçûn taxa jêrîn mala metê eman eman
Sala îsal tu çawa poşman bûyî, ez perîşan im ji ber sozê te bê
bextê eman eman
Ax zalimê ya ku te pê girtî yê min û te çû heya roja qiyametê
eman eman*

*Delal qurba tê bîra te ez û tû em bi hev ra diçûn goma jêrîn
eman eman
Tu yê bi derewa dixeyîdî diçûy, min lavê te diqir, diqir zarîn
eman eman
Ax bê bavê ka sûcê min ji te ra çîye te yê sala îsal ez birîndar
kirim, kirim mîna peza gura xwarî eman eman*

*Mal şewitîyê te çima ewê şevê ez nexweş xistim kirim nava
ciya eman eman
Ez rûniştim wekî zarokan ji xwe ra digiriyam eman eman
Te yê laçîk dabû ber devê xwe, tu ji xwe re bi dizî bi min
dikeniya eman eman
Bala xwe bidinê qîza bê bava dibê kuro lawikê min nizanbû,
ku tu yê wisa ji bo min dişewitî û di helliya eman eman*

*Koçera min ka wê rojê min ji te ra çî got ku tu xeyîdî eman
eman
Ji ber eşqa te li vê dunê li rûyê min nema şerm û fedî eman
eman
Ezê li ser danzde dewletê Eurupa yê digiriyam min yeqa
mîna delalîka dilê xwe zalim tê da nedî eman eman.*

Koçerê

*Ji Mûsilê çûm Bexda yê,
Serê min ketî belayê,
Min koçerek bedew dît,
Birîndar kîr li dunyayê.*

*Min ji koçera xwe hez kîr,
Xelkê ji xwe ra girt û bir,
Me ji hev du re sozeq da,
Wê piştî xwe bi min da kîr.*

*Bejna koçerê zirav e,
Ji min re pîr bêbav e,
Bume mêhvanê koçerê,
Min dî di şûşt berave.*

*Ax xurbetê tu xirab bî,
Tu car tu ji min re nabî,
Dibê ezê bi te ra birevim,
Destê min ji zara nabî.*

*Me dan hevdu bexî û soz,
Em bun xwedanê yek doz,
Roja destê me ji hev bû,
Ewê sozê xwe kîrî toz.*

Kolê te me

*Rûyê Mûşê girtî ewr û mije eman
Dijminê zalim xwîna kewê min dimije eman
Ji destê vî zalimî kewê min xwîn vedireşe
Ez kolê te me emrê xwe bêje eman eman eman.*

*Dîlbera min wekî roja li esman e eman
Çi bikim ketiye destê yekê zalimê nezane eman
Dil bi kul çav bi hêsir stûxwar û perîşan e eman
Destê min nagihîjê ji min re derdekî giran e eman eman eman*

*Rînda dunê tu ezîza li ber dilay î eman
Te wek rojê li esmana rohnî dayî eman
Tu taca zêrîn li serê melayi yî eman
Çi bikim îro destê dijmin da esîr mayî eman eman eman.*

*Kewê min bese negrî ne lorîne eman
Hêsrên bi ser sûretên sor û sipî da nebarîne eman
Te dilê min tijî kîr derd û kul û birîne eman
Birîndarê te me were halê min bibîne eman eman eman*

*Ya Reş va derdê han çi derdek zor e eman
Destê min nagihîjê ji min re gelek dûr e eman
Ez horî û melekkê cennetê naxwazim eman
Derdê dilê rezîl ew Menşûr e eman eman eman*

Kumreşî

*Cuwanî bar kîr ji wara
Dil tije ji kul û kedera
Esir mame li nav neyara
Ji evîna keça koçera.*

*Du demê wê nabine yek
Carnan li min dide tîrek
Cerg kul dike xwîn dirêje
Ku silav nede min carek*

*Ku bi xelkê ra xeber bide
Agir dilê min da dadide
Dikim ji kerba xwe bi kujim
Wek marê reş bi min vedide*

*Wê birîndar kîrim çend car
Nasekîne li yek girar
Bese bi min neleyîze
Bite vedim ez wekî mar*

*Rînda dinê zalima Kurd
Hiş û aqil ji min tev girt
Ez dîn kîrim berdam çolê
Umrê minê mayî kîr kurt*

Lê Zozanê

*Lê Zozanê lê Zozanê
Serê mêra bi qurbanê
Were em destê hev bigirin
Xwe bavêjin Kurdistanê*

*Zozan hat û xwe libakîr
Hiş û aqlê- bir wunda kîr
Min got carek te bibînim
Gelo çima xwe li min takîr*

*Lê Zozanê lê Zozanê
Serê mêra bi qurbanê
Were em destê hev bigirin
Xwe bavêjin Kurdistanê*

*Çav û birîyê Zozê reş in
Xeberdan û zarê wê xweş in
Kî Zozanê bi çavan dît
Bi ruh û canê xwe nexweş in*

*Lê Zozanê lê Zozanê
Sere mêra bi qurbanê
Were em destê hev bigirin
Xwe bavêjin Kurdistanê*

Li ku ye?

*Çûm ku xêber jê bistînim,
Hinekê derd û xema deynim,
Min pirr bakîr wê deng nekîr,
Ji bo wê ye îro ez dîn im.*

*Saet yanzdê beriya nîvro,
Dema xêberdana her ro,
Niza-m îro li ku maye,
Kûçikê bavê lê lê Seyro!*

*Îro çendê me tamam bû,
Em bi hev du pirr guman bûn,
Berê me pirr xêber dîda,
Du deng ji me ra nîşan bû.*

*Wê nîşana xwe ji bîr kirî,
Hiş û aqlê-m pê ra birî,
Îro roja suhibeta me
Ne li male çû mala jêrîn.*

*Min bêrîkîrî pirr gelek,
Ez heyrana çavên belek,
Peznê wê ez ji we ra nadim,
Delal e wek horî melek.*

Macirê

*Ji Mûsilê çûm Bexda yê,
Serê min ketî belayê,
Min macireka bedew dît,
Nexweş xistim li dunyayê.*

*Min ji macira xwe hez kir,
Xelkê ji xwe ra girt û bir,
Me ji hevdu ra sozeke da,
Wê piştî xwe bi min da kir.*

*Bejna macirê zirav e,
Ji min ra pîr bêbav e,
Bume mêhvanê macirê,
Min dî dişûşt berave.*

*Ax xurbetê tu xirab bî,
Tu car tu ji min re nabî,
Dibê ezê bi te ra birevim,
Destê min ji zaroka nabî.*

*Me dan hevdu bexç û soz,
Em bun xwedanê yeke doz,
Roja destê me ji hev bû,
Ewê sozê xwe kirî toz.*

Mêvana ezîz

*Min sehkir
wê mêhvana ezîz kerem ke,
bê koşka belek muşeref ke,
lê ditirsin ku koşkê neecibîne!*

*Dixwazim hemî jînên Cîhanê jê ra
têkim qewraş,
hemî mêrê dunê jê ra
têkim xîzmetkar,*

*xalîya raşim li ber lingên mêvanê
û serjêkim jê ra qûrbanê.*

*Geriyam xîzmetkar tunîne
û kêsekjî li mal nîne,
sivnik jî tune ku der dora paqij kim
guliyên min tune ku jêkim
têkim sivnik,*

*Avê kaniya miçiqîbûn,
min hesrên xwe barandin
pê cî û nivîne mêvanê şuşt û zaha kir*

*bi van dest û tiliyên nazik,
her derê koşka belek,
heya kulîn, serşo û tuwaletê jî paqijkir,*

*da ku mêvana mina
ezîz aciz nebe û kêfxweş be!*

Geriyam min xalî nedît,
raxîm li ber lingê mêvanê,
lê min şûnê da qebûl kîr
ser û çavane,
geriyam min pez nedît têkîm qûrban,
lê min xwe ji bonê amade kîr.

Da ku mêvana mina eziz
bê qûrban û
bê xalî neyê koşka belek,

Ling bide ser ser û çawên min
û min tekê qurban ji xwe re

û bi xwina min binivîse
lîser dîwara:
„Ez hêjame bi sed hezara
Qûrbanên wek te“

Ez pîr man li hêyîva mêvanê
bi defî mehane,

hêsrê min miçiqîn
xwîna min qedîya,
goşt û hestiyê min heliya,
kêra min jeng girt û riziya,

dîsa mêvana mina eziz
nahat û çavê min man li rêya!...

Min dîl ketê

*Ax dîlberê lê lê lê ax çoçerê way way
Te qelb işkê lê lê lê dîl gawirê way way
Çav belekê lê lê lê lêb şekerê way way
Kê dîl ketê lê lê lê dîl bû kerî way way*

*Bejna narîn lê lê lê wek fidane way way
Guliyên dirêj lê lê lê li nav milane way way
Çav û biriya lê lê lê reş kîldane way way
Kê dîl ketê lê lê lê hiş nemanê way way*

*Bejna Nûrê lê lê lê çi dirêj e way way
Reng û sîma lê lê lê ji xwe kej e way way
Ka wer sozek lê lê lê ji min re bêje way way
Kê dîl ketê lê lê lê kerr û gêj e way way*

*Çav û biriyê lê lê lê wê ciqas reş in way way
Bi rê da diçe lê lê lê hûr dimeşî way way
Çewa-m dît çû lê lê lê aqil û hişe way way
Min dîl ketê lê lê lê bûm nexweş e way way*

*Bejna zirav lê lê lê çi narîn e way way
Negrî hêsrân lê lê lê nebarîne way way
Te li min çêkîr lê lê lê kul-birîne way way
Te Mela kîr lê lê lê har û dîne way way*

Min xem nîne

*gehra felekê heye di hemi hewesên min da
hezar lezzet tam dikim ku dengê te belav be
di guhê min da
ew navê te yê şêrîn bêjim di nefesa xwe ya dawîn da
paşê bimrim min xem nîne Gula min!*

*evîndarê çavên te me ku du kevînan liser xwar û mêl da
evîna te sohtim hesreta dûriyê wek şûrek ma di dilda
xwezî balgîkî bama li bin serê te
min nefesên te têr bîhn bikîra paşê bimrama
min xem nîne Gula min!*

*ketim evîna cemala te ku li cihanê bê emsalî
ji horiyên cennetê ra li cihanê tu mîsalî
xwezî loqek xwarin bama li ber dîdanê te yên mercan
parçe parçe bibim dakevîm nava te
paşê bimrim min xem nîne Gula min*

*xwezî min carek di sehîkîra ew dengê te yê nazîkî xweş
wek perwanê li ber cemala rûyê te bigeriyama
bihelîyama liber agirê eşqa te bibim tune jiber tirêjnen rojê
di wan çavên belek da
paşê bimrim min xem nîne Gula min*

Min nezanê

*De wer lo kuro lawikî mingo hanê bi min hanê
Mal şewitiyo dilê min gola behra Wanê
Eydi erefat e xelkê bi destên dost û yarên xwe girtin
derketine kêf û seyrânê
Ez ebdala Xwedê ji xwe re bi tenê mame li quncê malê*

*Bi dilê şewitî derketim ber derê min pala xwe da stûna
dîwanê
Kuro malşewitiyo bidî xatirê Xwedê Pêxembera û Qur'anê
Were destê min bigire birevîn bavêje çiyayê Şengal û Zaxo,
Kurtik û Şerefdînê welatê şêrîn Kurdistanê
Qey tu nizanî mal xirabo li welatê xerîb çi hatiye serê min
biçûkê, min gundiyê min nezanê*

Nakîm

*Lê dîlberê dîlberê,
Ez heyranê dîlberê,
Delalê lêb şekerê,
Ez qurbanê dîlberê,*

*Neseqîne li wê derê,
Ez heyranê dîlberê,
Bê soza qîza kerê,
Ez qurbanê dîlberê,*

*Na welle na ez nakîm,
Welle bîlle ez nakîm,
Nexweş im ez dimirim,
Bê Ferat sebir nakîm,*

*Ne mirim te digirim,
Bê te îdare nakîm,
Li vê dunê bê mêr bîm,
Bê Ferat mêra nakîm*

*Dîlber yekê bedew e,
Evîndara min ew e,
Bext û sozên wê dan min,
Tev derketin derewe,*

*Tu axa ez kôle bûm,
Aşiqê bejna te bûm,
Meh û salan min qar nekîr,
Şev û rojan li bal te bûm.*

*Na welle na ez nakîm,
Welle bîlle ez nakîm,
Nexweşim ez dîmirim,
Bê Ferat sebir nakîm,*

*Nemirim te digirim,
Bê te îdare nakîm,
Li vê dunê ez bê mêr bim,
Bê Ferat mêra nakîm*

*Min te dîtî li zozanê,
Heyrana girêdanê,
Ji herd û sûretên sor,
Tu bide ramûsanê,*

*Diqîm nakîm tu nayê,
Zalimê bê wîjdanê,
Xwedê mirazê me bike,
Li ser îman û Qur'an'ê.*

*Na welle na ez nakîm,
Welle bîlle ez nakîm,
Nexweş im ez dîmirim,
Bê Ferat sebir nakîm,*

*Nemirim Te digirim,
Bê te îdare nakîm,
Li vê dunê bê mêr bim,
Bê Ferat mêra nakîm.*

Navê te û evîndarî

*navê te û evînî
evîn tu yî roja min
bê te evînî
bê evînî te nafiqîrim
roja min tu dîtî
evîna xwe naskîrî
tîrêjnên rojê didîn
pace û derî
yên te didîn dilê min
jiyan bê rojê nabe
dil bê te bê ruh dibe
nazîka min
kî dixaze bê ruh bijî?*

Navê te ye

*navê te ye evîna min
evîn jixwe tu bi xwe yî
roja ku min ji te hezkîrî
evîna xwe jî naskîrî*

*îro du roj mam bitenê
gula min çûye seyranê
bête nameşe dilbêrê
de ka were bê wîcdanê*

*carnan dengê xwe dibirî
dikujî vî pîremêrî
zanî tu ne bitenê evînî
belku ruh û canê min î*

*dengê te ji guhê min qut be
qiyameta min radibe
de ka were xezala min
li benda te me delala min*

*şevên bê te pîrr dirêj in
ji çavan xwînê dirêjin
nikarim ez tev bibêjim*

*tu meqsedam baş dizanî
çiqas xwedan derd û êş bim
ji birînên min re tu dermanî*

Naym Bîngolê

Keşa gozel minê ji te ra sonda tamam sond xwarîye ezê tu wer cara ji Xarpêtê naym Bîngolê....

lê mala minê.

Mal şewitîyê qey tu nizanî dilê min naxwaze li kêleka qotiyê pîsî heramê nemerdî mêra, ez bibînim lê te çav xezalê....

lê mala minê..

Kula Xwedê bi kul be bikeve derê qotiyê mêra çewa keşa gozel daye ber şkencê, keşa min ji destî vî kuçikê heram nexweş ketî nava ciya, jar û zeîf bûye, bûye wek qamîşê lê devê golê...

lê mala minê....

Dilber qurba tuyê bidî xatirê Xwedê û Pêxembera îdî bese tu negrî û ne lorîne, hêsrana bi ser suretû sor û sipî da nebarine, ez bi qurban bese êdî xema neke lê tu menalê lê mala minê....

Lê lê dilber qurba qey tu nizanî ezê bûm aşiqê te sala par vî çaxê li welatê xerîb serê herdû mehê zivistane lê li Botanê...

lê mala minê...

Ez nizamim tu îro çima poşman bûye te bextû sozê xwe tev danî..

lê mala minê.....

Ezê ji te re sonda tamam sond bixum bi sê sondê qesemê piştî çav û birîyên reş û belek bejna zirav li vê dunya rezîl tu wer cara ez nagerînim lê vî ruh û canî.....

lê mala minê.....

*Mal şewitîye qey tu nizanî li welatê xerîb kesê min tune ezê
bi ser da bigirîm, ezê ji bo xatirê bejna bilind çav û birîyên reş
û belek digirîm li çokê xwe dixim dikim nakim tu nayê rê, ax
zalimê nizam çima tu wisa ax lê bê wîdanî!...
lê mala minê.....*

*Lê lê kêwa gozel mal şewitîyê îro li welatê xerîb ez ji kêwa
kewî ribat im....
lê mala minê.....*

*Mal şewitîyê qey nay bîra te sala par vî çaxî li welatê xerîb
serê her du mehê zivistanê ez û kêwa gozel rastî havdû
hatin...
lê mala minê.....*

*Delal qurba eva bû serê sezde çarde meha, teyê çiqas cara
digot kuro lawikê were, ezê serê rê û dirba diketim lê ez
dihatim....
lê mala minê..*

*Mal şewitîyê ez nizamim tu yê îro çima poşman buyî, teyê
bext û sozê danî, Xwedê zane ji destê kêwa gozel ez
nexweşim lê bê tebat im.....
lê mala minê...*

Nedîtina te

*Evîna min nedîtina te
Ji min ra pirr pirr dijwar e
Stûxwar û şerpeze kîrim
Bûm sêwiyê ber dîware*

*Dûr ketim ji çavên belek
Ji wan guliyên wek tîremare
Jiyan ji bo herkesi xweş e
Lê ji boy min axa sar e*

*Bejna bilind wekî sîpan
Ji lêvan kewser dibare
Nabe? carek bose bidî
Ji wan dêmên wek hinare*

*Xwezî carek min bidîya
Bida qelen xwîna sore
Bê ala rengîn li bana
Jiyan bo min çiqas zore*

Nûrê

*Îro ji derdê durûyê,Nûrê
Dilê min birîn bûye, ...Nûrê
Şev û rojan bê halim, ...Nûrê
Dizanî bi min çi bûye. ..Nûrê*

*Hey Nûr hey Nûr hey Nûrê Nûrê
Ez heyranê Menşûrê Nûrê*

*Ku çend caran min te dî ...Nûrê
Min ji te tu xêr nedî, ...Nûrê
Dilê min da şîrînî, ...Nûrê
Wek rojê şu'le didî. ...Nûrê*

*Hey Nûr hey Nûr hey Nûrê Nûrê
Ez heyranê Menşûrê Nûrê*

*Eva bû çend carê te, ...Nûrê
Hatim dest û lingê te, ...Nûrê
Min got aşiqê te me, ...Nûrê
Dimirim ji boy çavên te. ...Nûrê*

*Hey Nûr hey Nûr hey Nûrê Nûrê
Ez heyranê Menşûrê Nûrê*

*Sozên didî derew e,
Gotina min ji te re ev e,
Eger ji min hez dikê,
Mirinê bide ber çave.*

*Hey Nûr hey Nûr hey Nûrê Nûrê
Ez heyranê Menşûrê Nûrê*

*Nura min bê qirar e,
Geh doste geh neyar e,
Ji eşqa te dîn û har im,
Dikim zarîn heware!*

*Hey Nûr hey Nûr hey Nûrê Nûrê
Ez heyranê Menşûrê Nûrê*

Oy Esmerê

Esmerê tu koçer î
Wekî rojê bi nûrî
Destê min nagîje te
Çi bikîm tu ji min dûr î
 Oy oy oy oy esmerê
 Zalimê dil gawirê
 Te ez kîrim aşiqê xwe
 Pişt da min mam li nivê rê

Dîlberek bê emsalî
Nîzanim ji bo çi dinalî
Çavê min man li rê ya te
Ji min re nabî bermalî
 Oy oy oy oy esmerê
 Zalimê dilgawirê
 Te ez kîrim aşiqê xwe
 Pişt da min mam li nivê rê

Esmera min narîn e
Serî li min digêrîne
Bext û sozê xwe danî
Dilê min kîr birîn e
 Oy oy oy oy esmerê
 Zalimê dilgawirê
 Te ez kîrim aşiqê xwe
 Pişt da min mam li nivê rê

*Ser tacê dîlberanî
Ezîza li ber dîlanî
Bûm qole û esîrê te
Ji min ra bê wîcdanî*

*Oy oy oy oy esmerê
Zalimê dîlgawirê
Te ez kîrîm aşîqê xwe
Pişt da min mam li nîvî rê*

*Esmerê tu çi bê bext î
Soz da min par vî wextî
Salêk li pey xwe gerandîm
Ji sozê xwe re bê hurmetî*

*Oy oy oy oy esmerê
Zalimê dîlgawirê
Te ez kîrim aşîqê xwe
Pişt da min mam li nîvî rê*

Por dirêjê

*Ax lê Nûrê lê Nûrê Nûrê..... lê Nûrê Nûrê lê Nûra min
Bejin ziravê lê te çav reşê.....lê porr dirêjê dîlbera min
Te bê sozê lê bê qerarê lê bê wîjdanê koçera min
Te ez nexweş xîstîm perîşan kîrim lê xîrab kîrî lê mala min*

*Ez û Nûra xwe lê çûne wara..... ..lê Nûrê Nûrê lê Nûra min
Me kêf henek kîr lê bin zinara.....lê porr dirêjê dîlbera min
Dengê Nûra min çû cinara lê Nûrê Nûrê lê Nûra min
Bavê zalim lêxîst bi daralê porr dirêjê dîlbera min*

*Min û Nûra xwe laqirdî kîr.....lê Nurê Nûrê lê Nûra min
Der û cinar li me guhdarî kîrlê porr dirêjê dîlbera min
Cîranî pîs lê fesadî kîrlê Nûrê Nûrê lê Nûra min
Bavê wê lêxîst bi yekalî kîrlê porr dirêjê dîlbera min*

*Nûra min ziravek narîn e.....lê Nûrê Nûrê lê Nûra min
Digirî ji bo min dilorîne.....lê porr dirêjê dîlbera min
Her roj ji min re silav dişîne..... ..lê Nure Nurê lê Nûra min
Dibê were lê min birevîne.....lê porr dirêjê dîlbera min*

*Ez û Nûra xwe lê çune sukê.....lê Nurê Nurê lê Nûra min
Me bazar kîr lê xêlya bukê.....lê porr dirêjê dîlbera min
Nurê dibê bi te ra direvim.....lê Nurê Nurê lê Nûra min
Destê min nabe lo ji zarûkê.....lê porr dirêjê dîlbera min*

Poşman im

Dilber qurba ciyê min dûr e lê lê ez te nabînim lêêê ez te nabînim,

Tîra eşqa te da dilê min, sala îsal lê lê ez har û dîn im lêêê ez har û dînim,

Tu dizanî ez bi hesreta te me, ez niqarim werim, tuyê bibe teyrek bifire were lêêê ez te bibînim lêêê ez te bibînim.

Dilber qurba ji min re nebêje tu kâl î, lê lê ez ter û can im lê ez terr û can im,

Min gelek cara qelbê te şikandî lê lê ez poşman im lêê ez poşman im,

Ji bo xatirê kewa gozel, ezê bi serê rê û dirba diqetim ez nexweşim lêêê ez perîşan im lêêê ez perîşan im.

Dilber qurba ez çi bikim lê lê bê fayde ye lê bê fayde ye,

Bê te mala min xirabe ye sebr û tebata lêêêê min tune ye lêêê min tune ye,

Mal şewitîyê ez niqarim werim tuyê firdê were, tu dizanî çavên min jî lêêê li rê ya te ye lêê li rê ya te ye.

Qîza kerê

*Gelo çawa tê ji bîr kîrin,
Derdê ewî şeva tarî,
Dellê ji min re înad kîrî,
Di ber mêrê xwe da xwe dirêj kîrî,
Ax dîlberê ax dîlberê,
Te bîhn xweşê gula zerê,
Qîze min bi te çi kîriye?
Min dîkuji qîza kerê!*

*Di kêve paxîla kero,
Têda hêka dipijîne,
Dema ku ez qebûl nekîm,
Her du çavê dirijîne.
Ax dîlberê ax dîlberê!
Bejin rindê gula zerê,
Sucê min ji te re çi heye?
Min di xapînê qîza kerê!*

*Qîza kerê ji min hez dike!
Belê mêrê xwe himêz dike,
Newêrim dev bidim deva,
Dev û çenê min gez dike!
Ax dîlberê ax dîlberê!
Te bîhn xweşê gula zerê,
Qîzê min bi te çi kîriye?
Min dîkuji qîza kerê!
Hin mirtib hatibûn gund, mêrik û hezkîriya xwe pevcûn, ji
wê gazin dikîr, min jî gotinên wî wek helbest nivîsînî.*

Rînda min

*Rînda min kêça koçera
Xistim halê birîndara
Kîrim esîrê neyara
Stûxwar mam li ber dîwara.*

*Rînda min kêçek macir e,
Bi qiymete wekî zêr e,
Biroj destê min digire
Bi şev ji bavê xwe newêre*

*Rînda min kêça badikî
Çima ewqas xwe liba dikî,
Ji min re wisa bi kîn û rikî
Cerg û dilê min kul dikî.*

*Rînda min kêça dewazî
Bi qurban bin muftî û qazî
Her roj dikim fixan gazî
Gelo çima ewqas bi nazî*

Rojekê

Ger rojekê xewa te bê
Ji zû va berê êvarê
bizanibî di xew da li benda te me
bang li te dikim
tu yê werî xewna min

Ger şevêkê ji nişkava ji xew rabî
xemgînîkî bê sedem te zevt bike
li der dora xwe kesî nebînî
bizanibî ku ez hêj ranazame li benda te me
tu yê li min bigerî?

Ger rojekê ji nişkava çavên te şil bibin
bê hemdî hêsrên te bibarin
şewatek hundurê te zevt bike
bizanibî hêsrê min ji boy te dibarin
tu yê werî hêsrê min paqij bikî gelo?

Ger rojekê serê xwe hildî bi çolan kevî
ku tu hestiyên mirovekî rizî û belavbûyî bibînî
bizanibî ku ez bi sed salan berê ji boy te
bi çolan ketime û di rêya te da mirime
tu yê hestiyên min himêz bikî gelo?

2002.02.19

Şevên Dirêj

*şevên zivistana
şevên dirêj
tarî
şevên kerr û lal
demên xemgîniyê ne
ku dûr bî ji yarê!*

*dîsa roja min çû ava
dîsa mam di taritiyê da
mam tenê di derd û xeman da*

*tîrêjnên tavê didin dilê min
ew in ronahiya şevên tarî
di xem û xeyala rojê de*

*min navê te kîriye tizbî
dikşînim libo libo
bi her dayîna nefesekê
wek zikrê sofîyan
ya ew ya ew dibê dilê min*

*tu razê gula min
ez nobetdarê evîne me
ta roja min derê
biçirîne taritiya şevê
min biqê nav baxçê gula
bi qurbana te bit dîla*

Şevêk

*Îşev şeva şayokê
min xwe dirêj kir
lî ser dîwaneke
tu ketî bîra min
û xew nakeve çavên min.*

*Derva sar e
baran dibare
wek derdê min
bi cêran tê xware.*

*Cîh ne tu cî ye
ne doşek û ne lihêf
û ne balgî ye.*

*Ez digirim nabînim
wan zendên te yên badayî
ji xwe re têkim balgî
wan guliyên te yên dirêj
wekim
ji dilê xwe re şekim
lî ser xwe belavkim
têkim lehêf.*

*Cî û nivînê qirêj
van şevên tarî û dirêj
têda dibim sewda û gêj.*

Newêrim razêm

tu têy xewna min
ji tirsaxew nakeve çavên min
lê tu li kuyî?
Li cem kê?

Tu dizanî
ez bê te ne tişt im
tu çûy te ez bê ruh
hîştim.

Tu têy ber çavên min
ez dibînim
destê xwe dirêj dikim
lê nakevî nava destê min
digirîm hêsir ji çavan dibarin
mendîla xwe dirêj dikî
çi bikim bi mendîlê
te dixwazim dînê lêê!

Tu yî cîh û warê min
tu yî stara min
wekî pêtekî agirî
ketî hundurê min
tu yî qidûmê çokan
tu yî ronahiya çavan

tu wekî xwîné
di rehên min da digerî
ez dizanim tu yê rojekî
li min vegeerî!

Tî mam
birçî mam
tazî mam
bê cixare û bê xew mam
lê min terqa te nekir
tu revî
min sebir kir.

Seet çarê sibê ye tu razê
ez diqim gazî
çi ferqa me heye?
Tu baş be
kêfa te xweş be
yê min tişt nabe

ji xwe ez ne zêde me
belkî perçek ji canê te me
sed car bi qasî xwe mezin bim
wek bizmara
bin sola te me!

Lê tu pîrr nezanî
tuyê rojekî qedrê min bizanî!

bê te şevek jî
lî min derbas bû
bi axîn û bi nalîn û bigirî
lê te heft xewn dîtî
bê min şevek jî
derbas kirî!...

Silav

*Ax qoçerê ax zalimê
Dikîşînim derd û elemê
Ji bo xatirê çavên belek
Ez razîme bi mirinê*

*Barî barana biharê
Hezar silav li wê yarê
Xwedê heqîya min baniya
Li ser çoka te qoçerê*

*Nikarim ez tev bibêjim
Çerg û dilê xwe bipêjim
Tu derdê min baş dîzanî
Bê însafê ka ez çi bêjim*

Eman lê Sosinê

*Eman eman eman eman eman eman eman eman lê sosinê
Mal şewitîyê tû yê bi rêkêti ji deşta Mûşê ez ji Mersînê
Emê derkêtine zozana me yê kônê xwe vegirtî li serê çiyayê
Şerefdînê
Heyla mala bavê te xirab be, teyê sala îsal mala min xirab kîr
hundirê min anî xwarê ez vedireşim ji av û xwînê*

*Hela dêna xwe bidînê çav û biriyên Sosina min çiqas reş in
Kewam dema bi rê da diçe çepilê xwe liba dikê hûrik hûrik
xweş dimeşe
Roja delalîka dilê xwe nebînim an jî dengê wê sehnekîm ez
wê rojê pîrr nexweş im
Ji ber eşqa kêwa gozel mîna însanê şerabê vexwe, bist û çar
saeta ez serxweş im*

*Heylawayê heylawayê heylawayê lê li min mame bê hêviyê
Mal şewitîyê ez dîmirim ji derdê te zalimê te nezanê te
gûndiyê
Ezê bi xulama bejn û bal û timtêl û girêdana te zeriye
Tû yê were ji bo xatirê dilê rezil min bistîne qebûl bike qara
vê hêwiye*

*Le lê sosinê ezê navê te nabêjim bi delalî gazi dikim dibê m lê
lê Gulê
Tê bîra te em bi hev ra çûn devê behrê rûniştin li hemberî
Hilton Otêlê
Emê ji xwe ra ketin kêf û heneqa, min dît sola te ji lingê te
da ketî golê
Mal şewitîyê eger tûyê bi min ra rastî were destê xwe li nava
destê min xê, ezê te birevînim bavêjim kambaxa bajarê
Stenbolê....*

Tê ber çavan

*Roja biçime pîknîkê,
Bi tenê bigerim li sûkê,
An bibînim zava û bûkê,
Dîlbera min tê ber çavan.*

*Xwe dirêjkim li ser dîwanê,
An jî ku biçim seyranê,
Dema bibînim tîranê,
Dîlbera min tê ber çavan.*

*Ku deng bê ji telefonê,
Birçî bim bixum xwarinê,
Li ber bayê li ber baranê,
Dîlbera min tê ber çavan.*

*Rûnê li ser qoltixekî,
Ramîsim destê şêxekî,
Bibînim axa û kolekî,
Dîlbera min tê ber çavan.*

*Ku vala biçê keda min,
Tarî be reşbe oda min
Bêşê bi îsotê mîda min,
Dîlbera min tê ber çavan.*

Tê bîra min!

*Bibînim bejneka zirav,
Ku çepilê xwe lîba bike,
Xwîna min dibe wekî av,
Ku koçera min tê bîra min.*

*Bibînim cotek birîyê reş,
Bi rê da biçê hûr hûr bimeş,
Bê hal dibim, dibim nexweş,
Ku Koçera min tê bîra min.*

*Ku yek hêsrana bibarîne,
An jî yek silav bişîne,
Yek jî yekî re bêje dîn e,
Koçera min tê bîra min.*

*Bêxêberdan behsa dîla,
Yek gulîya bavê ser mila,
An bikevim nav baxçê gula,
Koçera min tê bîra min.*

*Carek bibînim keştîyê,
An hinek biçin bêriyê,
Yek jî yekê ra bêj gundîyê,
Koçera min tê bîra min.*

Tenêtî

*Dema dil bişewite
xemgîn bibe
mirov niqare
bi tu awakî bîne ziman
tenê ew hêsrên
ji çavan dibarin
aha ewan hêsrana
dibîn hubir
hurik hurik dinvîsînin
xemgîniya dil
vedîşêrîn di arşîva
evîne da
ku li dor mirov
bi hezaran kes hebin jî
dîsa mirov tenê ye
dema hezkîriya mirov
ne li cem mirov be*

Tu napirsi

*Min ne bav e ne birane,
Min ne kеше ne xwedane,
Birînên min tev hildane,
Tu çima halê min napirsi?*

*Tu radîzê ez hîşyar im,
Ez belengaz im birîndar im,
Ji eşqa te pîrr xedar im,
Tu çima halê min napirsi?*

*Nexweş im min hal tunîne,
Cerg û dil safî birîn e,
Her jê dikşin av û xwîne,
Tu çima halê min napirsi?*

*Bes! Tu bibêje Nuredîn,
Te nû kirin hemî birîn,
Ji bona wê dîlbera zalim,
Cerg û dilê te bûne xwîn,*

*Cerg û dilê min bûne xwîn,
Tu çima halê min napirsi?*

Tu şîrîn î

*Tu şîrîn î wek şekîrî,
Îro ji min re tel kîrî,
Ku dengê wê ket guhê min,
Min dît ji bo min digirî.*

*Got êdî îdara min nabe,
Birîn kûr e derman nabe,
Heya qiyameta min rabe,
Eşqa te ji dilê min dernabe.*

*Navê kûrê xwe li min kîrî,
Her roj bi wî navî digirî,
Kêlek dêşê xwîn ji poza tê,
Wê kezeva min kîr kerî.*

Wax liminê

*Dilber qurba ji Amedê heyra vira,
Minê desta kewra gozel girtî, emê gav bi gav digeriyan li serê
dar û bera,
Kula Xwedê bi kul be bikeve derê van gawira,
Çawa destê dilbera min girtin birin, min sêwî û sitûxwar
hîştin li ber dîwara,
Kewa gozel Xwedê di zane gava dilê merifa di yekê da hebe
meriv nade bi bav û bira bi qîz û kura.*

*Dilber qurba ez rûniştîme li devê behrê li binê siya dara bîyê,
Tu yê satila bavê millê xwe wekî cara xwe libaqe were here
vê bêrîyê,
Ezê destê te bigirim birevînin bavêjim dewletek ji dewletê
europayê kambaxa Îtaliyê
Emê rûnên bihevra bikîjn kêf henek û laqirdiya wekî xortanî
li ser gemiyê,
Kewa gozel xelk aşiqê mal û mulkê dunê ez bûm aşiqê te
nezanê te gûndiyê,
Ax bê bavê ezê ji te ra sonda tamam son bixum, berfa welatê
me Serhedê dikeve erdê şeş meha ji erdê ranabe, bikeve nava
dilê min ebdalî Xwedê, tu wer cara dilê min sar nabe ji te
zerîyê.*

Wek hîvê

*Tu wek hîva seven nîvsayî
dî pişti ewranda
carnan derdîkevi
carnan xwe vedişêrî*

*ez wek mirovek
rêya xwe wendakîrî
dî şevên tarî di daristananda
dema te dibînim rêya min ruhni dibe
dîfikîrim ku siba min hat
roj wê derkeve
dema xwe vedişêrî
careka din wenda dibim
dî taritiya şeva reşda
bi hesreta te wek darek
ji daristana şewitî
bi hissên evîndarî ya te
rojên min wek şevên tari ne
dihelim wek berfa li ber tavê
ji ber awirên çavên belek
dî van rojên bi sîrr û serma yên
wek zivistana çilê Serhedê*

Were bê bexto

*Kuro lawiço hîne bi min hîne
Bihar e were em xwe bavêjin Kurdîstana rengîne
Dêna xwe bidê xemiliye bi mêrg û çîmen û gul û sosin û çav
kanîne
Malşewito îsal çarsal e derbekî li min xîstî, derdê min giran e
hundurê min birîn e
Eva sê mehê min temam bû li ser doxtora digirim çarekê ji
birîna min ra nabînin
Ji min ra dibêjin dermanê birîna te şêxo yê dîn e
Îro çilê min temam bû li koşê nexweşxana radîzêm, bê bexto
bese dek û dolaba li serê min negerîne
Ji xwe re rêya nebîne
Tu dizanê çavê min li rêya te ye, de neseqîne lezke were lo
min bibîne*

*De lo lawiço navê min Nûr e malşewitiyo navê min Nûr e
Bejna min bilind e, çavê min reş in, porrê min dirêj e, sûretê
min ê sor û sipî wekî roja li asîmanê hefta bi şewq û şu'le û
nûr e
Îsal çar salê me teman bû, te yê derbekî li bedena min xîstî ez
nizanim derba xencerê an jî derba şûr e
Na na welle teyê derbekî li serê dilê min daye, derdê min
giran e birîna min kûr e
Malşewitiyo eva çilê min teman bû li koşê nexweşxana
radîzêm, heyla bala xwe bidinê bê bextê min dek û dolaba li
serê min digerîne ji xwe re rê ya dibîne, dibêje keçikê ez
nikarim bêm rê ya min dûr e.*

De were lê Koçerê

*De were lêêêê de were lêêêê de were lêêêê lê koçerê,
Ezê bi xûlama bejin û bal û timtêl û girêdana te dîlberê
Lê koçerê ava behrê bi şewite leme leme
Min dît kewê min sekinî li devê avê, çûme rûniştîme wa li
ceme,
Minê destê xwe kirî taxîma sîng û berê dîlbera xwe, min dît
memikê delala min wekî cotek kewê gozel serî bilind kirine
berî dane hevdu bi hev ra dixwînin ez nizamim bi erebî an
eceme,
Na welle mîna sêvek ji sêvê Xelatê an jî porteqalek ji
porteqalê Mersînê hêşîn dibe li qanbaxa Çûqûrovayê li devê
çem e,
Ewê destên min digirt wêda dikir digot lawikê heval û
hogirê me li me dînhêrin malşewitîyo te ne eybe te ne şerme.
Minê dikir gazî gelî heval û hogira hun li qisûra min
nenhêrin hun dizanin ez aşiq û kole ê kewê xwe me,
Lê lê dîlber min ji te ra sonda tamam sond xwariye heya umrê
min bibe sed û yek sal, tuwer cara terkê çav û biriyên belek,
bejna zirav nakim, timî cara ez li hêvîya te me.*

*De were lêêêê de were lêêêê de were lêêêê lê koçerê!
Ezê bi xulama bejin û bal û timtêl û girêdana te dîlberê.*

*Dîlber heyran ezê bi delalî gazî dikîm dibêm hela wîrda were
 lê lê Xanê
 Ez û kêwa gozel rastî hev dû hatin serê her du mehê
 zivistanê,
 Bala xwe didimê sûretên wê sor bûne nizamim ji serma an ji
 ramûsanê,
 Memikê wê xal ketinê teze hatine hiyamê vê mizdanê,
 Minê bi desta girtî, em geriyane li bajarekî biçûk li
 Kurdistanê,
 Ji boy telefonê em hinek rûniştine li hêşîya postexanê,
 Emê bi hev re ketin gilî û gazin û gotin û xeberdanê,
 Minê jê re derdê dilê rezîl digot ewê bawer nekir, min jê re
 sonda tamam sond xwariye bi sê telaqê jin berdanê,
 Tuwer cara terqa çav û birîyê reş û belek nakîm, hetta li ser
 teneşo yê çenê min bên girêdanê.*

*Dilber qurba were em xwe bavêjin ser ziyareta Weysel-qerani
 disekîne li nava Bitlîs û Batmanê,
 Heke tu qebûl nakî em xwe bavêjin ser gorra Mela Hesênê
 Kurdmeydanê
 Na na welle emê xwe bavêjin nehya ziyaretê kavla Xaziya
 ser meqbera Şêx Mehmed Emîn Şehîdê Kurdistanê
 Emê duaî bikî belkî Xwedê biqedîne mirazê mirazxwaza
 yê min û te jî li ser îmanê*

*De were lêêêê de were lêêêê de were lêêêê lê qoçerê
 Ezê bi xulama bejn û bal û timtêl û girêdana te dîlberê.*

Were lê lê

*Îro dîsa qetiyam ji yarê
Ji ber eşqa kêwa gozel ez roj bi roj di hellim wek berfa biharê
Delal qurbq roja ku min û te ji hev xatir xwestî dilê min
şewitî, kêla min rabû, hêsrê min hatin xwarê were lê lê lêêêê
were lê lê lêêê!*

*Birîndarê te me lêêêê
Nexweşê destê te me lêêêê
Aşîqê bejn û bala te me lêêêê
Îsal çar salê min e ez li hêviya te me lêêêê
Bê bextê bê sozê bê qirarê tu çima nayê? De were lêêêê de
were lê lêêêê!*

*Min sehkirî dilbera min îro ji min ra selamekî şandî
Ji ber eşqa min û kêwa gozel hemî derya avê xwe miçiqandî
dara belgên xwe weşandî
Ax zalimê sala îsal te ez har û din kirim berdame çolê, welle
te kezeva min perritandî were lê lê lêêêê were lê lê lêêêê*

*Birîndarê te me lêêêê
Nexweşê destê te me lêêêê
Aşîqê bejn û bala te me lêêêê
Îsal çar salê mine ezê li hêviya te me lêêêê
Bê bextê bê sozê bê qirarê tû çima nayê de were lêêêê de were
lê lêêêê*

*Dîlber qûrba îro panzdê meha Gulanê
Min sehkirî kewê min ne xweşe, ez çûme ji bonê, pê ra ketim
gili û gazin û gotin û xeberdanê
Mal şewitiyê were ezê dûa bikim tû jî bêje amîn, belkî Xwede
mirazê mirazxwaza biqedîne yê min û te jî serê her du mehê
vê pahîzê li ser îmanê*

*were lê lê lêêêê were lê lê lêêêê
Birîndarê te me lêêêê
Nexweşê destê te me lêêêê
Aşiqe çav û biryê te me lêêêê
Îsal çar salê mine ezê li hêvîya te me lêêêê
Bê hextê bê sozê bê qirarê tû çima na ê de were lêêê de were lê
lêêêê*

Xaniyê Nûrê

*Xaniyê Nûra min li cîhkî tîk e,
Serê Nura min bi kofîke,
Eşqa li dilê min fêm nake,
Dilê melê xwe kul dike.*

*Xaniyê Nura min fireh ye,
Nura min tê da paldaye,
Nura min bi dunê hêja ye,
Ew gula dilê melê xwe ye.*

*Xaniyê Nura min deh ode ne,
Nura min wek taqa reyhan e,
Kes qiymeta wê nizane,
Ew taca serê mela ne.*

*Xaniyê Nura min du qat e,
Nura min tê da bê rûmet e,
Dûr im nikarim bêm ba te,
Li min nema sebr û tebat e.*

*Xaniyê Nura min mezin e,
Jê derketin cotek jine,
Ewa kinik ji min re nabe,
Zirava dirêj yara min e.*

Xatir xwestî

*Îro dîsa qetiyam ji yarê,
Helîyam wek berfa biharê,
Me xatir xwest ji hev li Karê,
Hêsrê min jorda hatin xwarê.*

*Vê cara han pîrr delal bû,
Wek rojê bi şewq û şemal bû,
Şans tune bû min têr nedî,
Lewra ew kûçuk li mal bû.*

*Dilber dilê min şewitandî,
Nav û cergê min perritandî,
Dema min xatir jê xwestî,
Giriya pê re dest hejandî.*

*Niza-m ji bo te çi bikîm,
Çavên xwe ji te ra qor kîm,
Ruhê xwe ji te re feda kîm,
Canê xwe qurbana te kîm,*

*Dilbera min koçera min,
Ax zalimê were bal min,
Way ez ketim sekeratê,
Rûnê tu bike şîna min.*

Min xem nîne

*Qehra felekê heye
di hemî hewesên min da
hezar lezzet tam diqim
ku dengê te belav be
di guhên min da
ew navê te yê şêrîn bêjim
di nefesa xwe ya dawîn da
paşê bimrim min xem nîne
Gula min!*

*evîndarê çavên te me
ku du kevîşan liser xwar û mêl da
evîna te sohtim
hesreta dûriyê wek şûrek ma di dîlda
xwezî balgîkî bama li bin serê te
min nefesên te têr bîhn bikira
paşê bimrama min xem nîne
Gula min!*

*ketim evîna cemala te
ku li cihanê bê emsal î
ji horiyên cennetê re
li cihanê tu mîsal î
xwezî loqek xwarin bama
li ber didanê te yên mercan
parçe parçe bibim dakevîm nava te
paşê bimrim min xem nîne
Gula min*

*xwezî min carek din sehkirra
ew dengê te yê nazikî xweş
wek perwanê li ber cemala
rûyê te bigeriyama
bihelîyama liber agirê eşqa te
bibim tune jiber tirêjnen rojê
di wan çavên belek da
paşê bimrim min xem nîne
Gula min*

Xewnek

Minê ji xwe ra xewnek dibû di xewê da dîlber! Dîlber! eman dîlber!

Min dît ez û kewê gozel rastî hevdu dihatin li cîkî xerîb di nav derî da,

Ez û delalîka dilê xwe em bi hev şah bûn di xewnê da,

Gava min çavê xwe ji xewê şêrîn vekir min dît ez birîndar im wekî hirça di çolê da,

Ê ku hatî serê min rebenê Xwedê bila neyê serê dijminê min di vê dunê da,

Çend roj şunva ez derketim ber derî min dît kewê min hûrik hûrik di meşê wa tê ji wêda,

Ewê demê min zanîbû ezê aşiq û perîşan bim di vê rêda dîlber! dîlber!. eman dîlbeeee!

Heywax li min heywax li min tu dizanî,

Kewê gozel tu çiqas zalimî ewqas bê îmanî,

Tuwer cara dilê te bi mirov naşewite, min nizanî tu wisa bê wîjdanî,

Te sala îsal mala min xirab kir, umrê min talan kir konê min ji nava kona rakir, te ez nexweş xistim kirim nava ciya te ruh ji canê min deranî

Wa ez dimirim ji bona çavên belek bejna bilînd ax dilgawirê tu nizamim çawani?

Dîlber qurba koça me bi rê ket dikîşîya dîlber! Dîlber!....eman dîlber!

Ez nizamim bextê min bû an jî bextê delalîka dilê min bû li tu cîyê neseqînî xweş meşîya,

Dema li me dibû êvar qoça me sekinî minê ji kewê gozel ra
 konekî wegirtî ji qone mûya,
 Meyê bi destê hevdu girtî emê rûniştine li hêşîya devîya,
 Emê bi hev ra ketin gilî gazin û kêf henek û laqirdiya
 Ezê bi hesreta çend salan çûme dest û rû ya,
 Min lava wê kir heta şeva me derbas bû heval û hogirê me li
 me tov bûn dicivîyan,
 Min got dîlberê were wa neke destê xwe li nava destê min
 bixê ez te birevînim bavêjim deşta Mûşê nehya Ziyaretê
 kavla Xeybiya
 Kula Xwedê bi kul be, bikeve derê heval û hogir û der û cînar
 û gundiya
 Çawa fesadîka xwe kirin dilê kewê gozel ji min hiştin dilê
 wê êşîya
 Malşewitiyê îsal çar sal e ez li benda te me, çavên min li rêya
 te getîya,
 Ji ber eşqa te goştê canê min helliya
 Hestiyên min riziya were dîlber! Dîlber...eman dîlber!

Heywax li min heywax li min tu dizanî,
 Kewê gozel tu çiqas zalimî ewqas bê îmanî,
 Tuwer cara dilê te bi mirov naşewite, min nizanî tu wisa bê
 wîjdanî,
 Te sala îsal mala min xirab kir, umrê min talan kir qone min
 ji nava qona rakir, te ez nexweş xistim kirim nava ciya te
 ruh ji canê min deranî
 Wa ez dimirim ji bona çavên belek bejna bilind ax dilgawirê
 tu nizanî çawani?

Xeyîdîm,

*Îro ji dîlberê xeyîdîm,
Ji xebêrdanê wê enidîm,
Wek agir di şewitîm ji bonê,
Niha ji eşqa wê cemidîm.*

*Ev çi êş û ev çi jan e?
Ku li min bûne peydane,
Ji cem min rabû çû odê,
Bûm stûxwar û perîşan e.*

*Min jê re got wê fêm nekîr,
Disa bi kûçik ra henekîr,
Ji înadê min re serî şûştî,
Gulîya bi ser xwe da belavkîr.*

*Gundîya cahil nezan e!
Sozek da min bi derewane,
Ez çar salan li hêviya wê mam,
Wê soz bi avê da berdane.*

*Derdê wê derdekî giran,
Xapandim dest ji min berdan,
Edî niqarim biqşînim!
Dunya li min bûye wêran.*

Xezal ay xezal

*Xezal ay xezal xezal ay xezal xezal ay xezal de lê tu xezal î,
Îro çendê min e li te digirim te nabînim tu ku va çûy lê ne li
malî,*

*Ez dizanim tu jî wek min ji dilê xwe va birîndar î, de lê lê
kûr dinalî,*

*Xezal ay xezal xezal ay xezal xezal ay xezal de lê lê tu
xezalî.*

*Xezal qurba ez dîn nebûm lê lê te ez dîn kîrim,
Te ez kîrim wekî Mecnûn li serê rê û dirba ez rast kîrim,
Di nav heval û hogiran da sala îsal ez şelpeze û şîvar kîrim,
Xezal ay xezal xezal ay xezal xezal ay xezal de lê tu xezalî.*

*Lê xezalê birîndarê te me şev û rojan diqîm zarîn,
Birîna min bê derman e, bê te xew nakîm lê şevên tarî,
Îsal çar salê min qedîya ez li hêvîya te me, îdî bese were te
ruh ji canê min deranî,
Xezal ay xezal xezal ay xezal xezal ay xezal de lê tu xezalî.*

Xezalek

Min xezal dît li zozanê
Bejin wek takî reyhanê
Pirr gerriyam wek wê min nedî
Ne li Cîhan , ne li Kurdistanê

Bejna xezalê bilind e,
Bedew e hem gelek rind e,
Nizanim gula dilê kê ye,
Ew kevoka li nav gund e.

Xezalê da min awire,
Berda dilê min agire,
Sozên dan min hemî vir e,
Xezala min dil gawir e.

Xezala min tu koçer î
Nizanim ezep an bi mêr î
Ez dizanim ji min hez dikî
Gelo ji tirsê kê *newêrî*

Yek

*yek tu hebûy
di hundirê min da
yek ez hebûm
min te nixandibû
lê niha?
hundurê min vala
dervayê min
dicemide
delala min!*

Yek nefes

*Xatir xwestina ji dilberê
ne wek mirina dê û bav e
Ku em mecbur bin biçin jî
tu wext destem ji te nabe*

*Dengê te yê xweş nayê min
Gelo awazê jî bo te bes e?
Ku sed salan li te binhêrim
Ji bona min yek nefes e!*

Zîna min

*Di tirsim ku jê dûrkevîm
Carek din çav pê nekevîm
Destê min û wê ji hev bi qete
Ezê dîn bim bi çola kevîm*

*Wekî berê jê hez dikîm
Çi bikîm destê min da nîne
Naxwazim xayîni pê kîm
Dilê min jê ra bi evîne*

*Tu xecê ez Siyabend im
Ez te bi hemî dunê nadîm
Ku wê zîna xwe nestînim
Li vê dunê bê mirad im*

*Ez Mem im lê tu jî Zîn î
Tu ji min ra gelek şîrîn î
Tîştê ji bo te nekîm nîne
Tu yê bi çavên xwe bibînî!*

Ez Xulam

*Bêrivana min çû bêriyê, elbê darîn di mil da
Silav neda û nenhêrî, miraz hîştî di dîl da
Bi wê bejna bilind meşî, gav fireh avêt û çû
Wekî mara bi min geztî, dîl ma di xem û kul da*

*Xezala Şengal û Cûdî, ji lêvan şekir dibarin
Hingivê şana mîsal in, di guh da zêr guhar in
Kamera zîvîn li pişt e, dîl girîftdar xedar im
Herçî kesên ku wê dîtin, nexweş in birîndar in*

*Qêrîn ji min çûne felek, ta heft qatê asîman
Ez bi lez rabûm, ji ber wê kevoka şahî cîhan
Ku bi destan bigirim carek, bi hurmet bikîm selam
Min bi beşşine! Razîme bibim kole û xulam!*

*Lê guh neda min got ka ez yar bim ji kê ra
Çima şerr nakî li hember dijmin hûn wekî şêra
Ez ne Dîlbera we me! Li rûyên we nanhêrim
Heya ku dîl û esîr bim li bin lingên neyara*

*Ez im bûka rojhilata navîn, ez im Kurdistan
Bihîştî rûyê zemîn im, ez im gul û Gulistan
Ez ne yara we me heyra ku hun min azad bikî
Ji dijminê rezîl ra bikî gorr û gorrîstan!*

Îd e îro

*Îd e îro ji roja, roja hîjdê Nîsanê ,
Her kesî destê yarê xwe girtin û çûn seyranê,
Ez tenê mehrûm û dûr im, mame li vê esîrxanê
Heya kengê wiha bimînim bi hesreta Kurdîstanê*

*Min ne îde, min ne îne, min ne şeve, min ne roje,
Ax dibêjim ji ber xurbetê, ji her du çavan xwîn dirije,
Nizanim xeta yê min çi ne felek,roj bi roj min dûr davêje,
Xelk bi welatê min şabe ez birîndar bim bi hîcranê.*

*Dil bi kul kezeb bi xwîn im, çav bi hêsir dev bi girî,
Derdê dunê bi min da dibarin wek baranê li min vekirî,
Ax xurbetê idî bese te can û cîger tev zer kirî,
Hetta kengê emê wiha bê weten bin li Cîhanê !*

*Ji bav û bira dost û yarê ez bûm cûda
Felekê birîndar kîrim darbe li ser darbê dida,
Perîşan im li cîhanê hêviya min maye Xweda,
Ku gelê me hîşyar bibe rabe ji bo serhildanê.*

Newroz û bihar e

*Birano rabin Newroz û bihare
Dilê bi xwîn nexweş e birîndare
Welatê min dilê li bin destê neyare
Dilê min parçe bû, bû pare pare*

*Welatê-min kanê bê zozan û war im
Dixûnim kêwribatê ser zinar im
Li qada xurbetê bêwelatî mam
Dilbixwîn im dikim zarîn heware*

*Kanê welatê min warê min kanê
Kanê Serheda min Ameda min kanê
Wekî leyi ji çavan xwîn dikîşe
Gula min dilê dijminê xwînçware*

*Bê kes im kes li çara min nayê
Bê Gula xwe ez çi bikim dunyayê
Agirê evînê sohtim sersala me hat
Ev çi derde birîn kûr e xedar e*

*Bihare xulîn ketiye çem û ava
Sersal û Newroz hat ser ser û çava
Li benda me ye fire bavêjin gava
Li Kurdistanê zarîn û fizar e*

Seroq dizane

*Ji min nepirsin ez kî me
Ez nizanim Seroq dizane
Ez azad im an bendê me
Ez nizanim Seroq dizane*

*Çiqas qedir bilind zat e
Ji hinkar pût, ji hinkar lat e
Çi namûs e çi welat e
Ez nizanim Seroq dizane*

*Bi bejn û bal ez çiqas im
Bi pêlav im an pêxwas im
Tirsonek im an mêrxas im
Ez nizanim Seroq dizane*

*Em li benda soza wî ne
Em kole yên doza wî ne
Kî berxê ber qoza wî ne
Ez nizanim Seroq dizane*

Çavên min tim wî bîne
Gelo çi ewqas şirîne
Kî bimire kî bimîne
Ez nizanim Serok dizane

Serokê-m bedel dunyayê
Bê wî azadî qet nayê
Em guhî bidin kîj sedayê
Ez nizanim Serok dizane

Ez golik im an jî berx im
Tîstekî bixum û nexûm
Dîlan bigrim an li xwe xim
Ez nizanim Serok dizane

Ez ne kerr û ne jî gêj im
Ne mamosta ne dengbêj im
Li ku rûnê çî bibêjim
Ez nizanim Serok dizane

Şeyx dizane

*Min teslîm kîrî îradê
Bi qurban kîr bav û dadê
Çi bêjim jî kes guh nadê
Ez nizamim Şeyx dizane*

*Sofitî tişteke pîr xweş e
Keştiya min wa dimeşe
Li herdu cîhan kî rûreş e
Ez nizamim Şeyx dizane*

*Însan çî ye heywan çî ye
Gotin çî ye peyman çî ye
Înkar çî ye îman çî ye
Ez nizamim Şeyx dizane*

*Qet xîrav nabe ara me
Baştir dizane kara me
Çi helal e çî heram e
Ez nizamim Şeyx dizane*

Şêxê min şeyxek bi nav e
Bê şêxê me jiyan nabe
Azadî baş e xîrav e
Ez nizanim Şeyx dizane

Şêxê-m emirke radibim
Bi wî şênlû û şa dibim
Bi çi serxweş û har dibim
Ez nizanim Şeyx dizane

Em li benda soza wî ne
Em krole yên doza wî ne
Kî berxê ber qoza wî ne
Ez nizanim Şeyx dizane

Nexweş

*Mela nexweş li nav ciya
Zarokên wî lê civiya
Deri vebû ji nişkava
Dijmin ketî nav deriya*

*Dikeliya wekî agir
Dijmin girtin ji ciya rakîr
Bi hevra destên wî girtin
Li ereba dijmin sarkîr*

*Desta girtin bikêf birin
Herdu desta kelepçe kîrin
Hun nizanin çi kêf dikîrin
Gotin me melê kurda girtin*

*Kîrin şikencek pîr mezin
Ji zulma wan erd dilerzin
Nizanin ku idî çi-b kîn
Wek kûçîka me digezin*

*Dijmin bi nav misilman e
Lê wan ne dîn ne îmane
Bi her çar ling û deva digirin
Di ewtin wekî tulan e*

Tu me îslah bikî!

*Ya Rabbî ez gunehkar im
Ji vî exlaqî bêzar im
Perîşan im tobakar im
Tu min îslah bikî ya Rabb*

*Li toba xwe nabûm xwedî
Li hember Te dikim fedî
Bê Te min dostek rast nedî
Tu min îslah bikî ya Rabb!*

*Dijmin her roj me diqujî
Her dem xwîna me dimijî
Kurdistan her bi Îslam dijî
Tu me îslah bikî ya Rabb!*

*Em li rûyê vê Cîhanê
Azad bikin Kurdistanê
Deynin ser hukmê Qur'an'ê
Tu me îslah bikî ya Rabb!*

*Hêza me hêza Îslamê
Her kes lê bike selamê
Ev e netîca keklamê
Tu me îslah bikî ya Rabb*

